



Stenbol



Amêd

Çalakiyên girseyî berî Newrozê dest pê kirin, di Newrozê de rengê serhildanê girtin. Bi hezaran kes li gelek bajarên Kurdistanê, Tîrkiye û cîhanê beşdarî pîrozbahiyên Newrozê bûn. Bi taybetî helwesta zarokên serhildanê balkêş bû. Ew li hemberî êrîşên hêzên dewletê bêdeng neman, bi kevîran bersiva êrîşan dan.

■ Li hemberî vê yekê MGK'ê çapemeniya tîrk xist dewreyê û wan jî dest bi şerê psîkolojîk kir. Di vî warî de xwespartina fermandarê berê yê ARGK'ê Şemîdîn Şakîk gihîşt hawara wan, çapemeniyê ev bûyer nepixand, li ser sernaryoyê cur bi cur nivîsand. Lê vê yekê bandor li gel nekîr, berpîrsên PKK'ê dan zanîn ku bi revîna wî tevgera kurd xurtir bûye, lewre ew kes bi kirinên xwe li ser têkoşînê bûye bar. Nûçeyekê ku hefteya çûyî di kovara Time de derket û hevdiştina ku akademîsyenekî amerîkî bi Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re kir, didin zanîn ku Amerîka di nava hinek hewlan de ye.

Rûpel-3



Wan



Iznîk

## Newrozê MGK marjînal kir

Hevpeyvîn li gel Şanoya Hêvî:

“Bingeha şanoya kurdî berhemdar e”

R. 8-9

Nîrxandin-Ahmed Huseyin:

Îsraîl, Barzanî û Kurdistan

R. 4

Vîranîn-Zülküf Kîşanak:

Weşîna şîrîn embaz Safyettin Tepe

R. 6



Azadiya WELAT



SAMÍ TAN

# Xapemeniya tirk û rojnamegerên kurd!

Xapemeniya mihemedok ber bi lûtkeyê xurifinê ve diçe, ew jî pêdiviya çapemeniya azad zêdetir dike. Divê em jî bi vê bîr û baweriyê nêzîkiyê di karê xwe bidin û çapemeniya neteweyî xurtir bikin.

Newroz îsal her wekî dihat hêvîkirin li welêt û metropolan bi serhildanan derbas bû. Çapemeniya tirk dîsa çavên xwe ji vê serhildana gelê kurd re girt û giranî da derewên bêbînî. Xapemeniya mihemedok! ber bi lûtkeyê xurifinê ve diçe, ew jî pêdiviya çapemeniya azad zêdetir dike. Divê em jî bi vê bîr û baweriyê nêzîkiyê di karê de xwe bidin û bingeha çapemeniya neteweyî xurtir bikin. Ne tenê pêdiviya gelê kurd bi vê yekê heye, her wiha pêdiviya gelên ku li Tirkîyeyê dijîn jî bi vê yekê heye. Çapemeniya xurifî, civaka tirk jî bi xwe re dixurifîne, rastiyan jî vedişêre, rastî bi tenê di civînên veşarî de tîn zimên. Êdî tiştêkî veşarî nemaye, li pey hev muxtira tîne weşandin. Saziyên ku li gorî dilê wan namesîn, tê de destkarî tê kirin; hin kes jî kar tîn avêtin, dirûvê rojnameyan tî guhartin. Hest û ramanên şovenîst û mîlîtarîst civak dîl girtiye, lewre jî kes nikare xwe tev bide, ango kes newêre ji generalan re

bibêje "siya we xwar e". Kesên ku li dijî rewşê ne jî ji ber berjewendiyên şexsî, helwestê nagirin. Hin kes jî wan ji çapemeniya azad çûne wan deran; gava ku wan di nav çapemeniya azad de xebat dikirin, dema yekî destê xwe bida rêznivîsa wan tofan radikirin, lê niha nûçe û nivîsên wan serdanpê tî guhartin, dengê xwe nakin. Ew kes dema tîn platformeke demokratan li hemberî rexneyan nikarin xwe ragirin, dibêjin: "Em rastiye dinivîsin, lê tî guhartin. Em çi bikin?" Dema yek jî bo xatîrê pereyan dev ji bîr û baweriyên xwe bernede, xwe bi vî awayî wekî malê pawanan nebîne, cihê ku lê dixebite wekî karistan û xwe jî wekî kedkarekî/bibîne, li gorî wê xwe bi rêxistin bike, dikare gelek tiştan bike. Divê gelê me jî wan kesan jî nêzîk ve nas bike û li gorî vê yekê li hemberî wan helwestê bigire. Kesên ku di çapemeniya azad de dixebitin jî, bi vî çavî li wan binêrin, lê bixebitin ku wan ji nû

ve bi rêxistinî nbikin. Di sedsaliya rojnamegeriya kurdî de divê rojnamegerên kurd ên ku di xapemeniya tirk de dixebitin, rewşa xwe di ber çavan re derbas bikin. \*\*\* Heftêya çûyî gelek kart û nameyên pîrozbahîya Newrozê ketin destê me, em ji xwediyên van nameyan re spasîyên xwe pêşkêş dikin û cejna wan jî dil û can pîroz dikin. Ji wan nameyan yek jî ji Girtîgeha Bartînê dihat, tî de hinek rexne jî li me hatibûn girtin. Ji ber ku me di vî quncîkî de gotibû: "Kesên ku xelatê qezenc dikin em ji wan re dişînin." Ji ber cih teng bû me nikaribû ku em bi berfirehî mijarê rave bikin. Li vir armanca me ew bû ku xelatên we jî hêla hêzên diyar ve tîn desteser kirin. Lê ji hevalan kirî ku em dibêjin, hûn xelatê qezenc nakin, lewre em ji we re naşînin. Em bi tu awayî bi vî çavî li mijarê nanihêrin. Ji bo pêkanîna daxwazên dîlên azadiyê çî ji destê me bê, em xwe jê nadin alî.

# Tevna azadiyê li dar ketiye

## Ferhengok

- |                                     |   |
|-------------------------------------|---|
| <b>babole:</b> lûr (dûrûm)          | <b>nof:</b> kom                           |
| <b>beledî:</b> çirîsk (kavilcim)    | <b>pawan:</b> monopol (tekel)             |
| <b>benîzava:</b> içgüveysî          | <b>pêngîhatin:</b> lêrasthatin, tûşîhatin |
| <b>berhemdar:</b> adan (verimli)    | <b>pixêrîk:</b> rojin, ocak               |
| <b>beyanîbaş:</b> rojbaş            | <b>çoçan:</b> bac, heraç                  |
| <b>çarpîne:</b> demdemî (dönek)     | <b>qumqumok:</b> keskamâr (kertenkele)    |
| <b>çespanandin:</b> teyîtkirin      | <b>qeytan:</b> tayên solan                |
| <b>çivdan:</b> kaytarma             | <b>qiyet:</b>                             |
| <b>cudayeti:</b> farklîlik          | <b>ravekirin:</b> izahkirin               |
| <b>dasî:</b> kîlçik                 | <b>rişt:</b> pûskûl                       |
| <b>destkarî:</b> mûdahale           | <b>sak:</b> çelîka gamêşan                |
| <b>germîfin:</b> sarûgermkirin      | <b>sarinc:</b> buzdolabî                  |
| <b>gewre:</b> mezin                 | <b>sixur:</b> noker, ajan                 |
| <b>herifin:</b> hilweşîn, rûxîn     | <b>temezî:</b> vale, çit                  |
| <b>hîmdar:</b> bingehsaz            | <b>wêberhênan:</b> ekonomîk yatırım       |
| <b>karîger:</b> bandor, tesîr       | <b>xewar:</b> xewok (uyku-cu)             |
| <b>karistan:</b> febrîka            | <b>xubar:</b> toz hûr                     |
| <b>kewar:</b> embar                 | <b>xurifin:</b> bunamak                   |
| <b>kiryar:</b> kîrde, fail          |   |
| <b>kiryar:</b> muştêrî              |   |
| <b>kîşwer:</b> iklim; kuta          |   |
| <b>kone:</b> qurnaz                 |   |
| <b>kumorî:</b> gêrik, mîro (kannca) |   |
| <b>lênişt:</b> lehî, laser (sel)    |   |
| <b>lûtke:</b> gopîtk, zirve         |   |
| <b>nezanok:</b> tekerleme           |   |

### JÊHAT GINGIM

Ka, ez nizamim bi kîjan navê şêrî bang li te bikim; "Welato". Bes e, na, "bejn û ruhê mezopotamyayê" na, lê "heyva şarîstaniyê" na ev jî ne bes e, "qibleya bi hezaran lehengan" na, dîsa jî ne bes e, "Dilê cihanê"...

Dê bêje! Ka çend tofan di ser te de hatin; qey geşî û dewlemendiya te bûbû qasidê bindestiya te; çend êl û eşîr li ser sînga te vemirîn, bi qasî çend rûbaran xwîna lehengan li te ziwa bû, te çend aşîq û meşûqan bi bêdengî, bi ker û lalî di kûrahiya dilê xwe de veşart.

Tu şahidê qîrîna Ninovayê ye, te Ehmedê Xanî xwedî kirîye. Dê vebêje welato! Bi bayê şefeqa Zagros re bistrê, keynî Ehmedê Xanî çendik û çend hunermend û rûmetgirên kurdan di tariyên avrêlê de winda bûn.

Welato! Jiyana Kurdîstaniyan mîna bextê te reş bûbû; Dê dilê xwe hinek din ji me re vebike! Ka çend xortan kezêba xwe peritandin, çend keçikan di şevên mişt tarî de, çavan li xwe kûr û reş kirin... Dê vebêje... nexweşiyên herî mezin li bedena te çêbûbûn, dermanê herî baş dîsa jî te çêkir. Çîroka te wê di çend hezar cildan de bi cih bibe. Qibleya hezaran lehengan bi axîve! Tu bi qasî xwîna pîroz sor bûyî, bi qasî kevza Dîjle û Ferat şîn bûyî, tu

bi qasî havîna Mezopotamyayê zer bûyî... Welato... Tu dizanî, bi milyonan şitlên te li koçberiyê bi penaberî, bi axîn û hesrêta te mirin. Ew kesera te ya di dilê wan da heya goran çû. Tu dizanî welato! Çavên ku çiyayên te dîtibûn, dîlên ku hewayê te kişandibûn, devê ku bi ava te şil bûbû bîyî te nikarin...

Heyva şarîstaniyê, tu dizanî şewata zarokan çiqas bi êş e; hezkirina za-

nen Xecê û Zînê ji bin axa sar derxist, xemiland û zindî kir.. Welato! Çi heyt bû ku ta çend salên borî çiya, newal, kanî û daristanên te xalî (tenha) bûbûn, çavên wan li dûv azadiyê di westîyan. Îroj welato îroj... Hemû deverên te bi qazînen refên kewan, bi hezkirinê, bi eşqa mirovahî û rastiye deng vedidin.. Welato dayik îroj tevnen azadiya xwe li dar dixin, zarokên xwe bi mizgînî di hembêza xwe de dişîdînin, şîrê xwe ji dil û can li wan helal dikin. Tu dizanî welato! Dagirkeran û hin qumqumokên li ser te dijîn, dilê wan mîna teniya pixêrîkê ye; carinan dibêjin "merheba" lê merhebaya wan bombe ye, vîrûs e; tal e, jar e... Wekî marê birîndar in, stêrkan dihejmêrin, hem lal in hem jî ker.. Niha, hemû welatparêzan serê xwe ji goran rakiribûna û tîkoşîna te biditana..! Niha welato... Niha em dibêjin:

Welato.... Dê Amed bi qinyetên dilên Apê Mûsa, Vedat Aydın... tevna xwe li dar bixe, wê Amed şevên xwe bi agirê Zekiyeyê... ronahî bike, dê kulîlkên herî rengîn, gul û sosin di Newala Qesaban de şîn bibin...

rok û însên, toreya te ya herî bi pêş de ketiye. Te ji hemû zarokên cihanê re baskên xwe vekirîye. Tu bi kedêke şîrîna ava dibî welato...Bejn û ruhê Mezopotamyayê, di çar parçeyên te de hemû kulîlk ji bo hêviyeke li ba dibin. Tu dibînî, tu şahid î roj cemedî li ser te çawa dihelîne; nexşên ji helbestên bêhnvedayî dilan mîna xalîçeyan li bin lingên mirovahiyê radixe. Tu dibînî, kilê çavan, kala kala dayikan çawa bi bayê sor re dilorînin. Te mirazê çendik û çend serokên me anî cih, bi saya serokatîyeke hemdem... Te axî-

"Welato, em evîndarê bedewiya te ne, serfiraziya te kilîda şadbûna dilê me ye, şewata hêlînan, nalînên birîndaran ji bo rizgariya te ye. Niha welato niha, dayik navika dergûşa xwe dibire, defa mizgînê lê dide. Niha welato, niha xwişk temeziya rengîn li birîna herîkiye dipêçe..."

Welato.... Dê Amed bi qinyetên dilên Apê Mûsa, Vedat Aydın... tevna xwe li dar bixe, wê Amed şevên xwe bi agirê Zekiyeyê... ronahî bike, dê kulîlkên herî rengîn, gul û sosin di Newala Qesaban de şîn bibin...



# Newrozê MGK marjînal kir

Çalakiyên ku di meha adarê de pêk hatin, navê wê mehê li ber dilê gelê kurd delaltir kir. Bi taybetî Newrozê sal di rengê serhildanên gelêrî de hat pîrozkirin. Hêzên tirk bi êrîşên ku birin ser saziyên neteweyî nikaribûn, rê li ber wê yekê bigirin. Bi van pîrozbahiyên konseptê MGK'ê ya bi navê marjînal kirinê, têk çû.

Li hemberî wê yekê şerê psîkolojîk hate rojevê, di wî warî de ji hêzên împeryalist û nokerên kurd jî alîkarî wergirtin. Çapemeniya tirk ji bo bandora van çalakiyan bişikîne, li malzemeyekê digeriya, xwespartina fermandarê ARGK'ê yê berê Şemdin Sakik, gihîşt hawara wan. Hemû rojname û televîzyonên tirk ew bûyer û Sakik nepixandin, cihekî berfireh dan wî. Di karî de hevkarîya Tirkiye, PDK û Amerîkayê diyar e. Li gorî agahiyên ku di çapemeniya tirk de derketine, nûnerekî Amerîkayê piştî wê bûyerê gotiye; divê PKK biqede.

Li aliyê din çend bûyerên dawîn nîşan didin ku Amerîka di nava hewleke nû de ye. Hate gotin ku akademîsyenê amerîkî bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevdiîtin çêkiriye. Li gorî heman çavkaniyan, ew ê agahiyên ku berhev kirine, rabîgihîne rayedarên Amerîkayê. Ji bilî wê, nûçeyekê ku di kovara Time de derketiye jî, hewla Amerîkayê ya di warê kêşeya kurd de nîşan dide.

Di wê nûçeyê de li ser penaberên kurd ên Yewnanîstanê û çalakiyên ERNK'ê tê rawestîn. Nûçeya navborî jî aliyê nêzîkê dayîne ve tîjî nakokî ye, li aliyekî gotinên wekî "terorîst, cûdaxwaz" ji bo tevgera kurd tîk bikaranîn, li aliyê din jî qala doza neteweyî û şoreşa kurdan tê kirin. Rayedarên tirk bi wê nûçeyê jî kêfxweş bûn, lewre ew dixwazin bi van agahiyan Yewnanîstanê bixin nava tengasiyê.

Lê aliyekî din ê nûçeyê jî heye. Di wê nûçeyê de tê gotin ku her hefte bi kêmanî 10 penaber, ji nû ve vedigerin welêt, dibin şervanên doza kurdî. Gotinên di dawîya nûçeyê de ramanên Amerîkayê yê li ser kêşeya kurdî didin dest: "Tirkiye bi nêzîkê dayîna ejderhayî ya li hemberî hindikahiya kurd wî agirî gur dike û her sal zêdetir kurd beşdarî merasîma ERNK'ê dibin." Yanê her çiqas Amerîka li dijî tevgera azadiyê be jî, ew dixwaze ku hin gav bînin avêtin.

## Pîrozbahiyê Newrozê

Pîrozbahiyên mezin îsal li Amed, Wan, Êlih, Îzmir, Edene, Enqere û Mersînê pêk hatin. Li van deran bi hezaran kes beşdarî pîrozbahiyên bûn, li Amed û Wanê gel bi kevîran bersiv da êrîşên hêzên dewletê.

Li Stenbolê berî Newrozê hêzên dewletê avêtin ser gelek saziyên kurd, gelek mi-

rov girtin binçav. Tevî wê yekê jî roja 21 yekê mehê, bi serkêşiya HADEP'ê û beşdariya EMEP, SIP û ÖDP pîrozbahiyekê girseyî li Meydana Kazlıçeşmeya Zeytinburnu pêk hat. Nêzî 30 hezar kesî beşdarî wê pîrozbahiyê bûn. Di pîrozbahiyê de alên ERNK'ê, parkartên ku li ser "Bijî Serok Apo, Ez jî PKK me, Bijî PKK, ERNK û ARGK" bal dikişandin. Pîrozbahiyê saet di 12.00'an de dest pê kir û heta saet 17.00'an dom kir. Di pîrozbahiyê de sloganên wekî "Bijî Newroz" "Bijî Serok Apo", "Newroz pîroz be", "Gerîla lêdixe, Kurdistanê ava dike", "PKK gel, gel li vir e", "Kurdistan wê ji faşîzmê re bibe goristan" hatin avêtin.

Li Amedê 50 hezar kes li meydana Ba-

qasî 2 hezar xwendevanî cejna xwe pîroz kir. Roja 21'ê adarê gel beşdariya di pîrozbahiyên resmî de red kir, serê sibê saet di 10.00'an de nêzî 40 hezar kesî berê xwe dan kuçeyê ku avahiya HADEP lê ye, gel guh neda banga polîsan a ku gel vedixwend pîrozbahiyên fermî. Li gelek cihan agir vêket, li kolanê komên 2-3 hezarî pêk hatin û pîrozbahiyên dest pê kir. Li ser wê yekê polîsan êrîşî gel kir. Gel jî bi kevîran bersiv da wan, di van bûyeran de 14 welatparêz û 4 polîs birîndar bûn, 50 kes jî hatin binçavkirin.

Li Îzmîrê jî pîrozbahiyên ji roja îne ve li zanîngehên Ege û Dokuz Eylülê dest pê kir. Di van pîrozbahiyên de bi qasî hezar xwendekar hebûn. Dîsa heman rojê bi qasî



Demînkê jî pîrozbahiyê Wanê



Pîrozbahiyê Stenbolê

tîkêntê gihîşt hev û cejna xwe bi girseyî pîroz kir. Pîrozbahiyê Amedê di rengê serhildanê de derbas bû, li ser êrîşên hêzên dewletê, gel li ber xwe da. Bi taybetî zarokên serhildanê bi kevîran bersiv da hêzên dewletê. Di êrîşa dewletê de gelek birîndar bûn, gelek kes jî hatin binçavkirin. Ji wan kes hatin hinek berdan, hinek jî hatin girtin, di nav kesên ku hatin girtin de ji delegasyonê itali Dino Frisullo jî hebû.

Li Wanê pîrozbahiyên pêşî li Zanîngeha 100. Yilê dest pê kir. Roja 20'ê adarê bi

1500 kes çûn ser gora Rahşan Demirel. Roja 21'ê mehê pîrozbahiyên li ber HADEP'a Konakê dest pê kir. Li vir 4-5 hezar kes gihîşt hev, saet di 10.00'an de meşa ber bi Meydana Cumhuriyetê dest pê kir, hejmara beşdaran gihîşt 25 hezarî. Li meydana alên ERNK û ARGK'ê derketin, sloganên wekî "Şehîd namirin, bijî Serok Apo, PKK gel e, gel li vir e" hatin avêtin. Pîroz-

bahiyê bi qasî sê saetan kişand, di belavbûnê de nêzî 25 xwendekar hatin binçavkirin.

Li Mersînê êvara 21 mehê li gelek taxên kurdan ên wekî Yenipazar, Gündoğdu, Güneş, Demirtaş, Çay, Çilek, Karaduvar, Alsancak, Barbaros û Kurdaliyê agir hat vêxist û pîrozbahî çêbûn. Pîrozbahiyê mezin li Meydana Cumhuriyetê roja 22'ê adarê çêbû. Digel astengiyên dewletê dîsa jî bi qasî 50 hezar kes beşdarî wê pîrozbahiyê bû.

NAVENDA NÛÇEYAN

## Kurtenûçe

Komîteya Parastina Rojnamegeran ên Serbixwe (CPJ) rapora xwe ya sala 1997'an weşand. Li gorî raporê, herî zêde di girtîgehên Tirkiyeyê de rojnameger hene. Di raporê de tê gotin ku, li 14 dewletên cihanê de 26 rojnameger hatine kuştin û li 24 dewletan jî 129 rojnameger hatine girtin. Di raporê de rewşa Tirkiyeyê bi awayekî neyinî tê nirxandin û tê gotin ku di heman salê de ji 69 rojnamegerên girtî hê jî wan 29 bi cezayên giran di girtîgehê de ne.

Rewşa Awarte (OHAL) ku ev 14 sal e, li Kurdistanê didome, ji bo bajarên Amed, Sêrt, Çolemêrg, Şernex, Dêrsim û Wanê cara 31'ê ji bo maweya 4 mehan dîsa hate dirêjkirin. Ji bo encamkirina tezkereya Serokwezîriyê roja 24'ê adarê Lijneya Giştî ya Meclîsa Tirk bi beşdariya 300 parlamenteran civiya û tezkere bi erêkirina 207 û redkirina 91 parlamenteran hate pejirandin. Vê carê jî, wekî carên berê dirêjkirina maweya (dem) Rewşa Awarte (Rêveberiya Taybet) bi pêşniyaza Lijneya Ewlehiya Netewî (MGK) pêk hat.

Piştî girtina rojnamevanê İtali Dino Frisullo, ku piştî çalakiyên Newrozê li Amedê hatibû girtin, hikumeta İtali bi riya Balıyozxaneyê Tirkiyeyê ya Romayê, nerazîbûna xwe li dijî Tirkiyeyê ragihand. Sekreterê Giştî yê Wezareta Derve ya İtalyayê Umberto Vattani, xwest ku Frisullo di zûtirîn katê de serbest bê berdan. Li hêla din hate ragihandin ku, Dino Frisullo di qawîşa 17'an de avêtine hucreyekê. Rojnamevanê İtali Frisullo, bi hinceta kurdan teşwîqî cûdaxwaziyê dike, hatibû darizandin û pişt re jî hatibû girtin.

Du penaberên Nînovayî bi navê Ahmet Benek (65) û Abdî Benek (55) ku ji hêla hêzên PDK'yî ve hatibûn revandin, bi awayekî serê wan jêkirî, di navbera gundê Musyan ku di bin kontrola Iraqê û gundê Bêesla ku di bin kontrola PDK'ê de ye hatin dîtin. Hate tespît kirin ku di laşên penaberan de şopên îşkenceyên xedar hene û destên wan ji paş ve hatine girêdan. Penaberên Nînovayî ev demeke dirêj e ku li nêzîkî Bajarê Mûsilê hatine bicihkirin. Lê tevî gelek serlêdanan penaberên kurd dixwazin ku li nêzîkî Herêma Silêmaniyeyê (herêma YNK) bicih bibin.



# Îsraîl, Barzanî û Kurdistan (II)

**Bes Tevera Azadiyê bi şerê xwe roj bi roj qirêjîya vê siyasetê derdixê holê. Siyonîst di pir deman de, xwe mîna alîgirê gelê Kurdistanê didin nîşan.**

**Lê dîmena herî zelal, ji hemû karê ku pêk hatine re, bêguman dîrok bi xwe ye. Rûpelên dîroka têkiliyên Îsraîlê bi hêzên Kurdistanî re gelek bi qirêj e û tarî ne.**

**B**enî Îsraîl di destpêka dîrokê de bi şerên ku li hemberî pêxemberan dane meşandin, tên nasîn. Ew li hemberî hemû pêxemberên ku ji nav wan derketine, rabûne û ew nepejirandine. Li hemberî Hz. Yusuf, Zekêriya, Yehya, Îsa û heta bigihe Hz. Mihemed. Dîsa jî ew xwe mîna nîjada pîroz didin nasîn. Gelê ku herî zehf qirkirin li serî pêk hatiye di ve cihanê de dîsa cihû bi xwe ne. Ji ber koçberiyê û qirkirinên ku her dem li ser wan pêk dihat, roleke mezin dane sixurtiyê.

Her çiqas dibêjin, sixurtî ji bo parastinê ye, lê parastina xwe li ser qedera gel û qewmên din pêk anîne. Çimkî di bingeha siyaseta wan de ramana; "Pêwîst e hemû gel xîzmeta cihûyan bikin." heye. Yanî kî dimire bila bimirê, kî tê tunekirin bila bê tunekirin lê, cihû divê bijîn.

Wê siyasetê ev 40 sal e ku li ser gelê Kurdistanê jî pêk tûnin. Lê ew siyaseta xwe bi rengê veşartî didin meşandin. Ji bo vê siyasetê Serokatiya Tevera Azadiyê gotiye: "Cihû hêzeke cihanî ne. Hêzek veşartî ye û hakim e." Lewre dek û dolabên wan li ser Kurdistanê veşartî mane.

Bes Tevera Azadiyê bi şerê xwe roj bi roj qirêjîya vê siyasetê derdixê holê. Siyonîst di pir deman de xwe mîna alîgirê gelê Kurdistanê didin nîşan. Lê dîmena herî zelal, ji hemû karê ku pêk hatine re, bêguman dîrok bi xwe ye. Rûpelên dîroka têkiliyên Îsraîlê bi hêzên Kurdistanî re gelek bi qirêj e û tarî ne.

Îsraîl di 1958'an de dest bi lêgerînekê dîke, ku têkiliyan bi PDK'ê re bide çêkirin. Di wê demê de mercên başûrê Kurdistanê hatibûn guhartin. Di tîrmeha 1958'an de li Iraqê albay A. Kerim Qasim piştî ku derbe li dijî Qiral Faysal kir, hewcedariya wî hem bi Mele Mistefa Barzanî hebû û hem jî bi ya komunîstan hebû. Piştî efiya giştî Barzanî ji Sovyetistanê vedigere, A. Kerim Qasim têkiliyên xwe bi Cemal Abdil Nasir re datîne û ji aliyê din ve jî nêzî Yekîtiya Sovyetê dibe. Van tiştan jî bo Îsraîl rewşeke bi xetere çêdikir. Çimkî Îsraîl hem nû çêbûbû, hem jî Cemal Abdil Nasir di wê demê de helwestek li hemberî hêzen împeryalist girtibû. Lewre ew guhartinên ku di herêmê de çêdibin û li dijî berjewendiyên DYA, hêzên împeryalist û Îsraîlê



Avakarê PDK'ê Mele Mistefa Barzanî

bûn. Li aliyê din jî ereb xurt dibûn û derfetên damezrandina Kurdistanê jî, roj bi roj dikemilîn. Jixwe kunêra (çiban) ku hem ereb û hem jî gelên Rojhilata Navîn diêşand û pirsgirêkên herêm dixitimand, kunêra kurdan bû. Lewre Îsraîl bi salên 1960'î re dest avêt meseleya kurdan û têkilî bi PDK'ê re danîn.

Têkiliyên Îsraîlê bi PDK'ê re bi rengê fermî û timî di sala 1966'an de dest pê kir. Li ser destpêka têkiliyên Îsraîl û PDK'ê mebusê Îsraîlê Lûba Eliav di hevpeyvînekê de (sal 1981'ê) wiha diyar dîke: "Serokwezîrê Îsraîlê Levî Eshkol di wê pêvajoyê de (1966) jî dixwaze ku ew here Kurdistanê. Tevî heyeteke tendirustiyê diherin di navbera sinorê Îranê-Iraqê de bi

Mele Mustefa Barzanî re diaxîfe. Ji wê demê de hem alîkariya pereyan û hem jî ya çeka bi wan re dikin."

Heta tê diyar kirin ku her mehê berpirsiyarekî mezin ji Îsraîl çûye bi Mele Mistefa Barzanî re axiviye û her carê 50 hezar dolar dane wî. Ew pere tê dayîn ji bo ku M. Mistefa Barzanî livbaziyan xwe li hemberî Iraqê xurt û berdewam bike. Li gorî rapora CIA'yê jî tê fêmkirin, ew pereyên ji bo Mele Mistefa Barzanî alîkariyê bide kesê musevî ji bo ku bikaribin ji Iraqê derbasî Îsraîlê bibin. Yanê têkilî li ser bingeheke wisa tê meşandin.

1-Ji bo ku pirsgirêkên herêmê werin berdewamkirin û bê-aramiya ku heye were xedarkirin. Çimkî bê-aramiya Kurdistanê û Iraqê bêaramiya

herêmê ye.

2-Ji bo ku kesên musevî ji nav ereban bikaribin herin Îsraîlê. Heta derfet were dayîn ji cihûyên Kurdistanê re ku ew bikaribin herin Îsraîlê. Çimkî Îsraîl dewleteke biçûk e û hewcedariya wê bi kişandina mirovên cihû heye. Heta bikariye di şerê li hemberî ereban de xwe li ser piyan bigire.

3-Bi destxistina Kurdistanê Îsraîl dikare bi rihetî berjewendiyên hêzên împeryalist biparêze. Jixwe alîkariya hêzên împeryalist ên ji Îsraîlê re ji jî bo vê yekê ye.

4-PDK'ê mîna çekêkê hem li hember azadixwazên kurd, ereb û hem jî li hemberî Yekîtiya Sovyetê bidin şixulandin.

5-Bi van têkiliyan wê bikaribin M. Mustefa Barzanî ji Yekîtiya Sovyetê dûr bixin û heta dikarin wî li hemberî Yekîtiya Sovyetê bidin şixulandin.

6-Ji bo êrişkirina Yekîtiya Sovyetê rîya herî nêzik ji bo dewletên împeryalist Kurdistan bû. Di vir de rista PDK'ê pêwîst e û ji bo pêşerojê berjewendiyên xwe biparêzin ji siyaseteke li ser bingeha têkiliyên Îsraîlê bi PDK'ê re wê bikaribin heta demeke dirêj serweritiya xwe hem li ser Kurdistanê û hem jî li ser herêmê bidin meşandin.

Her çiqas DYA û Îsraîl pir caran di daxuyaniyên xwe de diyar dikin ku ew dixwazin mafên kurdan biparêzin jî, lê raporên CIA (22.01.1997) bi temamî berevajî vê yekê nîşan didin: "Em guman nakin ku hevalbendê me Îran wê baş li avakirina hikûmeteke otonomî mîze neke. Muteffikê me mîna me, di wê baweriyê de ye ku rewş were girêkirin wê hêj baş bibe... ne em û ne jî mûteffikên me dixwazin ev pirsgirêk were çareserkin." Belê, ev rapor, hem mebesta wan û hem jî sedemên alîkariya wan ji PDK'ê re bi rengê zelal ji mirov re diyar dîke, ku ew çiqas dixwazin mafên kurdan biparêzin(!)

Dîsa li gorî rapora PIKE (Rapora Komîteya Istixbarê ya Meclîsa Nûnerên DYA'yê 19.01.1975) ne serokê DYA Nixon, ne Herî Kisinger ne jî şahê Îranê dixwest dewleteke kurdan were damezrandin.

Ji van bûyerên li jor bi zelalî tê xuyakirin ku ev hêzên, paşverû çawanêzîkî Kurdistanê dibin.

AHMED HUSEYIN



# Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

- Wane 4 -

## /î/ û /ê/ya berî /y/ye

Taybetiyên dengên kurdî bi ev qasî jî naqedin. Mijareke ku li ser gotûbêj çêdibin jî, rastnivîsandina tipên /ê/ û /î/ berî tîpa /y/ye ye. Hinek weşanên kurdî li ser şopa Celadet Bedirxan diçin û dema ku yek ji wan dengdêrên dirêj berî /y/ye tê, wê bi dengdêreke kurt diguherin. Ango /î/ya berî /y/ye bi giştî û /ê/ya berî /y/ye bi piranî cihê xwe dide tîpa /î/, hin caran jî tîpa /ê/ cihê xwe dide /e/ye.

**Celadet Bedirxan wekî nimûne, van peyvên dide:**

/ê/	/î/
Pê piyê wî	derî deriyê me
Dê diya te	tîlî tiliyên min
Rê riya wan	xanî xaniyê te

Lê hemû derdor û zimanzanên kurdî li ser vê dîtina Celadet Bedirxan li hev nakin. Bo nimûne Baran Rizgar di pirtûka xwe ya bi navê "Dersên Zimanê Kurdî" de dibêje: "Rast e, ew her du deng (/î/ û /y/) nêzî hev in û ji hev dixwin, lê yek, a din ji holê raneke, lewre pêwîst nake ku tîpa /î/ bibe /i/. Li aliyê din Feqî Huseyin Sağınç di pirtûka ya bi navê "Rêzimanê Kurdî" de li ser vê mijarê vê nirxandinê dide: "Ew peyvên pirkîte yên bi dengdêra /î/, /û/ye biqedin û /y/ya kelijandîne jî bigirin, her çiqas carinan nayine xwendin jî, lê tene nivîsandin." Yanê li gorî Sağınç ew yek di nivîsandinê de tu guhartinê çênake. Li aliyê din hinek zimanzan her çiqas dîtînen Celadet Bedirxan bipejirînin jî, ji bo ku

teşeya (form) peyvê xera nebe, di nivîsandinê de vê rêpîvanê li ber çavan nagirin. Dîsa hinek zimanzanên kurdî balê dikîşînin ser astengiyên ku ew rêpîvan dikare di perwerdehiya zarokan de derxe holê û ji ber vê yekê jî li gorî vê rêpîvanê tevnage-rin.

Li gorî dîtina me ew biryara Celadet Bedirxan di cihê xwe de ye, lewre jî divê li gorî vê rêpîvanê bê nivîsandin. Li gorî pratîka xebata rojnamegeriyê û waneyên zimên fêrbûna vê rêpîvanê zêde ne dijwar e. Dengdêrên dirêj /î/ - /ê/ û niv-dengdêra /y/ ji hev dixwin, di bilêvkirinê de tîpa berî /y/ye kurtir dibe. Divê bê gotin ku di alfabe ya erebî de her du deng bi heman tîpê tê nîşandayîn, dîsa di îngilizî de hin caran /y/ di cihê /î/ye tê bikaranîn. Heman rêpîvan jî bo tîkiliya di navbera /û/-w/ye de jî derbas dibe. Yanê /û/ berî /w/ye jî vediguhere dibe /i/ ji ber ku ew her du deng jî tîkildarî hev in.

Mîrov dikare dengdêra /û/ wekî dengê hevedudanî bi nav bike. Ew deng ji dengên /w/ û /î/ pêk tê. Gelek nimûneyên ku vê dîtîne diçespînin hene. Li hinek herêman peyvên wekî gûz, kûr, dûr, sûr bi teşeyê gwîz, kwîr, dwîr, şwîr jî derdikevin pêşberî mirov. Ev yek jî tîkildariya dengê /w/ - /û/ye nîşanî mirov dide. Ji ber vê yekê jî /û/ya berî /w/ye her wekî di mînakên li jêr de jî tê dîtî, dibe /i/.

Rû	riwê min
xwesû	xwesiwa wî

çarsû	çarsiwa wan
bûn	bibiwa (bibûya)

Her çiqas seyda Feqî Huseyin Sağınç gotibe /û/ berî /y/ye nayê xwendin jî, Celadet Bedirxan tiştên li dijî vê ramanê dibêje. Jixwe li hinek herêmanê Kurdistanê dema veqetandekê tînin dawîya peyva ku bi /û/ye diqede, di cihê /w/ye de /y/ye wekî tîpa kelijandîne bi kar tînin û di bilêvkirina wê de tu arîşe namîne. Di cihê "riwê min" de "rûyê min" dibêjin. Dîsa divê mirov bide zanîn ku di bilêvkirina tîpa /û/ de li gorî herêman dubendiyek heye. Li hinek herêman ew tîp wekî /u/ya tîrkî tê bilêvkirin. Li hinek herêman jî nêzî /û/ya tîrkî tê bilêvkirin. Ji ber vê yekê hinek kes /û/ya tîrkî jî dixin nava alfabe ya kurdî. Yanê hinek peyvên wekî "bûk, çûk, bûn" mîna "bûk, çûk, bûn" dinivîsin. Lê bi dîtîna me ew yek di alfabe ya kurdî de tevliheviyê pêk tîne.

## Pevguherîna tîpa kurt û dirêj

Pevguherîna hinekê dangan li gorî herêman vê dîtîna Celadet Bedirxan xurtir dike. Ji ber ku tîpên niv-dengdêr tîpên berî xwe kurtir dikin, dema ew tîp ji holê radi-bin, dengdêreke dirêj cihê dengdêra kurt digire. Di pirtûka Feqî Huseyin Sağınç de ew rêpîvan wiha hatiye şîrovekirin: "Gava li nivhend yan jî li dawîya hinek peyvên /h/ hebe ew /h/ dikare bikeve û dengdêra kurt cihê xwe bide a dirêj wê ji zayendê. /e/ dikare cihê xwe bide /a/ye, /i/ cihê xwe

bide /î/ye û /u/ cihê bide /o/ yan jî /û/ye."

Seyda li ser vê mijarê çend mînakên ji dide wekî;


çehv /çav, sih/sî, rih/ rî, cih/cî, xwehr /xwar, buhtan/ botan, cuh/ co, duht/dot -

Hê gelek mînakên ku vê rêpîvanê nîşan didin hene. Di zimanê nivîskî de nezana vê rêpîvanê dibe sedema tevliheviyê û çewtiyan. Ji wan her du teşeyên peyvê neqandina yekê, zêde arîşeyan demaxe pêşberî mirov, ji ber ku her du jî rast in. Yanê yek dikare "cih" an jî "cî" binivîse. Lê mirov dibîne, îcar gelek kes "cih, sih, rih, tirih, doht, xwih" dinivîse, ew tiştêkî çewt e û bilêvkirina wê jî gelekî dijwar e.

Divê em hinekî jî li ser dengdêra /u/ rwestin, lewre hinek taybetiyên wê jî hene. Ew dengdêreke kurt e û bilêvkirina wê ji bo kesên ku bi kurmancî nizane hinekî dijwar e. Gelek kes wê wekî /u/ya tîrkî bilêv dikin, ew jî dibe sedema hinek çewtiyan. Li gorî Celadet Bedirxan ew deng jî ji tîpên /w/ û /i/ pêk hatiye, lewre jî bi hêsaniyê guhere, dibe /i/ wekî "tu/tî, çu/çi, ku/ki". Li aliyê din gelek peyvên ku bi vê dengdêrê tînin nivîsandin di teşeya /wi/ de jî derdikevin pêşberî mirov, mîna; "xurt/xwîrt, xu/xwî/ qurt/qwîrt..." Li gorî Celadet Bedirxan ew deng jî bilî çend awarteyan nayê dawîya peyvê û bi piranî dikeve pêşiya dengdêrên "g, h, k, q, x" wekî *hunda, hundir, guh, guher, gulat, gulok, guman, guzvan, kuç, kul, kulî, kum, kurt, kurm, qub, qul, qurç, qunders, qure, qurm, xubar, xumre, xur, xurdek, xurîn, xurt...*

## Ez ji we bi hêvî me

OSMAN ÖZÇELİK



**K**oçerên Asya Navîn, hatin gelê me yî bicihbûyî, li ser axa wî kirin koçber û bi xwe bi cih bûn.

Koçer; rojekê li vir, rojekê li wir in. Av, şenkayî û çêre li ku derê xweş be, koçer konê xwe li wir vedigirin. Koçer, dîrokê û demê ne bi sedsalan dipîvin. Li ba wan pîvana demê ya herî dirêj demsal e. Jiyana koçeran li gorî demsalekê tê tanzîm (saz) kirin. Di havînan de, li çiya û zozanan bin; di çile de, di rojên zivistanê yên sar û sermayê de dadikevin beriyê. Ji ber ku koçer, dizanin jiyana wan a li wê deverê ne domdar e, qesir û qonaxan ava nakin. Qesir û qonaxên wan konê reş ên gewre ne. Konê koçeran bi qasî qesirekê mezî û bikêrhatî ne. Koçer çandiniyê nakin, dar û beran naçînin, belê pez û dewarên wan cur bi cur in. Koçer bîran nakolin, belê firaqên ku pê avê dikşînin pir in. Qet nayê bîra koçeran ku darên gûzan, darên behîvan biçîkînin. Avakarîna otel, camî, mînare û medreseyan, vekirina rîyan, lêkirina piran, çêkirina pirtûkxaneyan ne karê koçeran e. Ev

karûbarê civatên bicihbûyî ye.

Civatên bicihbûyî, bûyer û serpehatiyên xwe, ceribandî û zanînen xwe dinivîsin, çap dikin û di kutupxaneyan de vedîşerî û diparêzin. Bi vî awayî berên ji jiyane bi dest ketiye û zanînen xwe, mîna xelateke bêhempa ji qirn û nîşên nû re dihêlin.

Gava demsal diqede û koçer konê xwe didin hev, ku barbikin; firaqên xwe li ser piştê ker û hesp û hêstiran bicih dikin; serpehatî, bûyer, zanî û tecrûbeyên xwe yên danisî, bi melodiyên mûsîka xwe, bi ritmê dansên xwe ve ku ji xuşîna dar û pelan, ji şîreşîra av û çeman, ji şîreşîra civîkan girtine jî li ser piştê mêtî û bîra xwe dişîndin û wan bi xwe re koçî cihêkî nû dikin ku li wir, ji nû ve bi deng û ritmeke nû bixemilînin.

Belê, hinek ji wan ber bi bayê zozanan, hinek ber bi berî û baranê û hinek jî ber bi çeman ve diçin û wînda dibin. Li şûna ked û barê jiyana civakî ya bi sed demsalan, ji nîşên nû re mistek adet, zanî, melodî, dans, bûyer ceribandî û çand dimîne. Ji bo tiştên ku bi berê û baranê çûye, ji nû ve bi dest bikeve divê civat, dîsa wan bijî.

Kolonyalîst, bi zanebûn û bi biryar gelê me diajon nav jiyaneke koçeriyê. Nahêle lingê gelê me cih bigire, nahêle gelê me saziyên xwe yên civakî ava û bi rêkûpêk bike. Xêr û xweşiya me bi mirina wan e.

Jiyana rewşenbîrên me jî fena (wekî) ya gelê me ye. Jixwe, kesên ku jiyana xwe bi ya gelê xwe ve girê nedabe, mirov nikare ji

kesên wîlo re bibêje rewşenbîr. Ji ber vê ye ku piraniya rewşenbîrên me ji Kurdistanê bi dîr xistine, hinek ji wan çûne di Kanada û di Afrika Başûr de derketine. Li welatê xerîbiyê bûne penaber. Dagirkeran ji rewşenbîran re tenê riya koçeriyê hiştine û konê rewşenbîrên me li ser piştê wan, vir de wê de koç dikin. Ji ber vê ye ku rewşenbîrên me, singê konê jiyane xwe kûr nakutin.

Do, ji rojnameya me Memet, bi telefonê li min geriya. Bi qasî meh û nîvekê ye ku bayê dewletê li me xistiye û em jî jiyana xwe ya "niv serberî" bi dîr ketine. Çendek hevalên me hatine girtin û me hinekan jî xwe ji ber xezeba dewletê piçekî daye aliyekî. Ji ber vê sedemê min nivîsên quncikê xwe parîkî fîmal kirin. Memet digazîni û digot: "Hindek nivîskarên me yên li derve jî nema dikarin nivîsan ji me re bi rê bikin". Tu nabê ew jî daketîna başûr.

Ez bawer im hûn dizanin daketîna başûr tê çî wateyê: Rastiyek me jî ev e ku, siyasatmedarên me mecbûr dibin ku bibin şervan; şervanê me bibin nivîskar; nivîskarên me bibin hem siyasatmedar û hem jî şervan. Em jî bi qasî hêza xwe li hemberî vê jiyana bîrûmet tîdikoşîn. Geh bi pênûsa xwe li ser kaxizên spî û geh bi ruhekî netewî li qada siyasatê.

Min bêriya we kiribû, lê we? Bi rastî ez nîzanim hûn çend kes rojnameyê dixwînin û ji yên rojnamê dixwînin hûn çend kes vî quncikê dixwînin, ez nîzanim. Belê, hûn yek kes



# Weşîna şîrîn embaz


## Safyettin Tepe

**D**estpakerdina ney şoreşî ra na het ra, ebi hazarana merdiman weşîna xo vinî kerd û şehîd kewtî. Şoreş winî xorî û hera vila bi ke, binê zîndan ra heta koyan, keyan miyan ra heta cayê mabênê jûbînê şaran berz bi. Şarê ma qandê weşîna azadey, çend ke ci dest ra amê, lecê reyayînê xo da û hewna jî hergî roj tayna pêta dano. Qê çiyê jî nêşeno şarê Kurdistanî, reyayînê bandorkaran ra vindarno. Dişmen çend ke zilmê xo vêşî keno û dano ci ro, şar jî hind ebi lepan û mêjgê xo ya xover dano û weşîna xo azad keno. Kes vînenê ke, rewşê pereyî vizêrî ra, rewşê vizêrî jî ewroy ra vêşêrî rover de wo. Na weşravêrdin jî, ebi goniya şehîdana ray gêna.

Ewro ra winî ayseno ke qandê reyayînê welatî hewna merdimî yê zaf şehîd bikewê. Çirê ke bê merdimê şoreşgeran û welatperweran tu welat bandorkaran ra nêreyawo. Çi heyf o ke ze reyayînê şarê bînan, reyayînê şarê ma de jî, lacek û keynekê şirêgnayî û bêtersî weşînê xo şoreş de kenê vinî. Xora nê weşînê birûmet û delalî reyayînê şaran û welatan rê benê meterîsî. Nê meterîsan ra jew jî, weşîna embazê ma wo şîrîn embaz Safyettin Tepe wo.

Embaz Safyettin lacê dedê embazê ma rojnameger Ferhat Tepe yî bi. O sera 1968 de şaristanê Bedlîsî de ma ya xo ra biyo. Ey lîse na şaristan de wendbî. Bahdoyê lîse jî, Zankeyê Anadolu de, fakultê karê îdarî de wendê. Malbata ci çosmedê xo de ebi welatperwerinê xo ya silasnayeyê. Çimke malbat ra gêrlay zâf vejyayî û çahar-panc embazî jî na malbat ra şehîd kewtî. Coka dişmen peynamê Tepe ra biyê xînt. Tunika kamî ra wexto ke peynamê Tepe vejyayê, dişmenî heme çî jî ardê ci sere. Çirê ke wazeno ters bido şarî ke kes nêbo welatperwer û pey Tepeyan ebi qeç û qulê xo ya nêkewê şoreşî miyan.

Embaz Safyettinî, bahdoyê şehadetê embaz Ferhatî biryarê xo da û bi rojnameger. Herûnda Ferhatî veng (tal) nêverda. Ey Özgür Gündem, Özgür Ülke û Yeni Politika de rojnamegerin kerd. No mabên de Bedlîs,



Stenbol, Agirî, Entab, Adna û Batman de xeftiyayînê xo yê rojnamegerin ard ca. Kotî ca veng mendê, embazan o riştê wija. Ê her kar de û her ca de, bi bêvengî xewetiyey, qet mirûzî nêkerdê û embazanê xo dir weş viyarnayê.

Ma Stenbol de piya xeftiyayî. O, embazanê xo miyan de zaf hezkerde bi. Rojnamî miyan de jî, tu wext qet acizî nêvetê. Wexto ke o, jûyî ra aciz bibêne jî seba selamê rojnameyî a acizbûnî qurtmay xo zere. Bi sereyê xo ya, qe çiyê jî nêkerdê. Embazanê xo rê zaf rî akerde bi. Coka jî çî kar bikerdê verî embazanê xo dir şewiryeyo, bahdo qerarê kerdiney dayê. Embazîna xo de zaf demokrat û zerîpakî bi. Bejna ci derg û girs bi, la belê zaf gonegerm bi. A bejn û xuset qe pê nêmana ye. Kîştê ra bejna girsîn û kîştê ra jî xusetê qeçikan. Nê hurdina çî, ey de winî weş vindertê ke, kes nêşeno tesawûrê ci bikero.

Embaz senîn fikiryayê winî asayê, senîn asayê jî winî fikiryayê. Fikir û weşîna ci verniya pê akerdê. Wexto ke kesî, o ardê çimanê xo ver, eke weşîna ci ra kêf girotê, hindê ey jî xusetê ci ra biyê kêfweş. Min jew embazê ci ra jî, kîştê ey ra lomeyê jî goştarin nêkerd. Ancî hemînan jî, vîranîne xo yê weşî

ardê ziwan.

Zey embazê ma hemînan, min jî ey ra Ferhat silasna bi. Embaz Ferhat rojname de hewna newe dest estbi xeftiyayînî ke, kontrayanê dewleta Tirk, embaz remna û ebi îşkencewo girdiya şehîd vistbi. Bahdoyê şahadetê ci, ma wênayê ci ra Ferhat silasnabi. Cok ra ma Safyettinî ra embaz Ferhat silasnayî. Ey qandê embaz Ferhatî wina vatê: "Ferhatî raya raşt, da ma vernî, sifte o şî koyan, la belê sihatê ci, ca de nêbî. Coka embazan o peyde riştî keyî. O no fin kewt rojnamey, çend mengî rojnamey de xeftiyê bi ke, dewlete o remna û bi îşkenceyan şehîd kerd. Ferhat, malbat de zaf hezkerde bi. O qe çiyê ra jî mahrûm nêbi, heme çî jî destê ci bind de estbi. La belê ey, weşîna ferdî ra qe hez nêkerdê. Ey waştê bi ke şarê xo ya bibo wêrê heme çî. Nê çiyar ra jew jî azadeya welatê ma Kurdistan bî."

Wexto ke ey Ferhat ardê ziwan, ganê ci lertzayê, çimanê ci werdî biyê û xo ra rawêrdê. Zek adir kewtbi zerya ci û ganê ci weşnayê.

Embaz Safyettin wexto ke şehîd kewt, şaristanê Batman de, rojnameyê Yeni Politika de xeftiyayê. Roja 22 gelawêjê sera 1995'î de polîsan,

embaz Safyettin, Aydın Bolkan û Ramazan Ötünç piya berd asayişê siyasî. A şew Aydın û Ramazan viradiyay. Polîsan Safyettin berd Bedlîs. Îşkenceyanê Bedlîs de roja 29'ê gelawêj de meyitê ci vejyaya. Polîsan çimanê dinyayê verde jew rojnameger ebi îşkenceyan kîşt. Birayê ci yo pîl, Tayip Tepey şahadetê ci sero wina vatê: "Na dewlet birayê min ebi zanayina kîştî. Ez wazena, ê polisên ke îşkenceyanî de xeftiyênê, wa biwejiyê mahkima. Wa ma bêrê pê hetek ke ez vajî to, to, to birayê min kîşt. Ez zana înan senîn birayê min kîştê. Verê hemînan jî mesûlê weşîna birayê min polîso ke namê ci Şükrü yo. Şükrü hîrê finî min rê vat: Eza kokê Tepeyan biyarî. Eke tain bo jî rûmetê na dewlet hiqûqî rê esto, oyo kîştixanê birayê min, vejo mahkema ver. La belê baweriya min ebi na dewleta kontrayana çiniya."

Roja bîn embazo ma wo delal rojnameger Safyettin, Bedlîs de kalekdê Ferhatî de dayî hera. Embazê gunegerm, ewro vêşer goniya domananê ma zey to germ bena. Adirê şoreşî raya rayayina şarê ma akena, ma to xo vîra nêkenê.

ZÜLKÜF KIŞANAK



□ 30 adar 1995:

### MED TV dest bi weşana xwe ya ceribandîne kir.

Televîzyona kurdî ya yekemîn MED TV ji Ewropayê dest bi weşana xwe ya bo ceribandîne kir. MED TV' weşana xwe ji Ingilîstanê li ser peyka Eutelsata 2'yan bi weşana ceribandîne da destpêkirin. Televîzyona kurdî di destpêkê de rojê 3 saetan weşan dikir. Piştî weşan derket şeş saetan. Di demeke kurt de weşan bû heşt saet. Li dijî hemû zordarî û hewlên dewleta tirk MED-TV îro 18 saetan weşan pêk tîne.

### BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 30 adar 1972:


### Mahir Çayan û hevalên wî li Kızıldereyê hatin kuştin.

Piştî girtina Deniz Gezmiş û hevalên wî ji bo ku rê li ber dardekirina wan bê girtin, Mahir û hevalên xwe 3 teknîsyenên îngilîz revandin. Li Kızıldereya ku li ser Niksara Tokatê ye, Mahir û hevalên wî Cihan Alptekin, Omer Ayna, Saffet Alp, Ertan Saruhan, Ahmet Atasoy, Nihat. Yılmaz, Hüdâyî Arıkan, S. Kazım Özdoğru, Salahattin Kurt û 3 teknîsyenê îngilîz ji aliyê hêzên dewletê ve hatin kuştin. Bi tenê Ertuğrul Kürkçü bi saxî hate girtin.

## Pêşangeha Merşîkên Kurdewarî:

# Merşîk jî

# asîmîle bûne



Mixabin wekî her tiştê kurdan, çînen (desen) otantik ên kurdewarî, ku bi sed salan e li ser merşîkan tîn neqîşandin jî para xwe ji asîmîlasyonê wergirtine. Berî niha bi 70-80 salî merşîkên ku ji aliyê kurdan ve dihatin çêkirin, bêhtir bi çînen kurdewarî dihatin neqîşandin. Lê îro çînen biyanî jî li ser merşîkan kurdan tîn dîtin.

Roja 22'yê adarê ji aliyê TEKSAV'ê (Weqfa Çand Huner û Perwerdehiyê ya Tirkiyeyê) ve li MED-KOM'ê pêşangeheke merşîkan hate vekirin. Pêşangeh wê heta 5'ê avrêlê bidome. Di pêşangehê de merşîkên cur bi cur cih digirin. Neqşên merşîkên ku li pêşangehê hatine rakistin, ji aliyê kurdewarîbûna xwe ve ne berbiçav in. Her çiqas kesên ku merşîk çêkirine, xwestine motifên kurdewarî bi kar binin jî, lê bi ser neketine û bêhtir xwe bi neqşên klasîk ên ku tîn zanîn, sînor kirine. Digel van yekan wekî ku Sekreterê Giştî yê TEKSAV'ê Tahir Kızılyıldız jî dibêje, ev bêhtir xebateke amatorî ye.

### Armanç pêşxistina motifên gelêrî yên kurda ne

Li gorî agahdarkirina Kızılyıldız, armanca weqfê ya sereke pêşxistin û parastina motifên folklorîk ên kurdewarî ye. Sekreterê Giştî yê TEKSAV'ê diyar kir ku, neqşên herêma Mûş û Bîngolê ji neqşên herêma Wanê kurdewarîtir

in. Her wiha weqf, ji bilî van yekan hin karûbarên din jî pêk tîne. Kesên ku ewlehiya wan a civakî nîn e, ji aliyê weqfê ve tîn xebitandin. Dîsa weqf ji bo kesên ku rewşa wan a aborî ne baş e, suxrekariya tendirustî ya bêpere û belavkirina hin pêdiviyên girîng jî, kar dike. Li aliyê din weqfê di sala 1997'an de li Amedê pêdiviyên 250'î xwendekaran tevî pêdiviyên kirtasiyeyî peyda kirine. Her wiha ji bo xwendekarên zanîngêhê jî bursa taybet tê dayîn. Li ser pirseke me Sekreterê Giştî yê Weqfa TEKSAV'ê Tayîb Kızılyıldız, di dirêjahiya axaftina xwe de wiha got; "Dema ku li Kurdistanê gund hatin şewitandin, tu kesî nedikarîbû eşyayên xwe bi xwe re ji gund derîne. Me ew kesên ku gundên wan hatine şewitandin dan şixulandin. Di nav wan de jî me girîngî da malbatên herî xizan. Em dixwazin ku kurdên ku ji hilberîne hatine dûrxistin, ji wê jiyana kambax li gorî asta karî û şiyana xwe rizgar bikin." Her wiha wî daxuyand ku dewletê li ber xebatên wan yên li Amedê astengî derxistine. Bi taybetî jî dewletê xebatên wan ên li ser tendirustiyê asteng kirine. Di dawiya axaftina xwe de wî got ku, "Keçên me di emrê xwe yê ciwan de, hînî xebatê dibin. Di kargeha me de 30 xebatkar kar dikin. Ew bi nirxa keda xwe hesiyane. Ev nişana pêşketin û zanebûnê ye."

AZAD ALTUN

### ÇAVDÊRÎ



### Semînera 22 adarê û kurdên li Stokholmê

MÎRHEM YÎGÎT

Êdî li derveyê welat ji zeman jî bo kurdan dixebite û li xêra wan roj hiltê û diçe ava. Li vir li paytext û gewrebajarên Ewropayê jî jiyana me bîmanetir dibe. Em li hev dicivin, bi hev dişewirin, dîtin û boçûnên xwe dikin yek, pîrs û pîrsgrêkên xwe munaqesê dikin û bi lezeke zêdeyî texmînan, em dibin paleyên avakirina yekîtiya neteweyî. Neteweya kurd li seranserê Ewropayê, li Almaniya û li Swêdê bi giştî li cihên dîr ji welat jî avê dibe, organize dibe û evîna welatekî azad û serbixwe di dilê derketiyên me de mezintir û hê mezintir dibe. Dilxwaz û xebatkarên yekîtiyê zêde dibin. Hestê lihevnezişkûnê di nav rêxistinên de, di nav kes û şexsiyetên serbixwe de û bi giştî jî di nav kurd û Kudistaniyan de gelekî berçav e. Ev hest mora xwe li jiyana rojane dide û kêlî bi kêlî hinekî din dibe diyariyeke xwedî pêşeroj.

Kurdistanbûn û yekîti jî meseleyeke fikrî û daxwazê pêkhatina wê dîr derdikeve û bi laş û gewdetir dibe. Dibe kultur, dibe exlaq, dikeve her malê û ji kurdên Rûsya bigire heta bi yên Anatolê, yên kelhûr, feylî û şexbizîni bigire heta bi yên ji Lubnanê hatine, pêl bi pêl her kesî dikîşîne nav xwe. Kurd destên xwe dixin nav destên hev, milên xwe didin milên hev û din û fêr dibin çawa bi hev re kar bikin. Her wiha kurd îro ji her gavê çêtir li hev guhdariyê dikin û bi qedir û qîmeta serok û şervanên xwe dizanin. Guhartin û pêşketineke heralî heye di nav kurdan de. Bêşik û bêdudilî mirov dikare bibêje ku pîrsa hevdujirtin û lihevbanîne îro ji her carê aktueltir e. Ev pîrs ketiye serê lîsteyê û bi qasî dixuye û mirov dişopîne de heta serxwebûna Kurdistanê jî ji cihê xwe nekeve û germahiya xwe biparêze.

Yekşema 22'ê meha adarê ji her çar aliyê Stokholmê kurdan berê xwe da taxa Tensta. Zêdeyî 400 kurdî li saloneke vê taxê bi navê Tensta Tráf hatin ba hev. Ji her perçeyê welêt zarava, mezhep, siyasat û îdeolojiyê kurd hebûn. Salon tijî û mişt bû, zimezim jê dihat. Hêwayeke germ û hevkarîxwaz bixêrhatina mirov dida. Geşbîni û hêvî bandêr bû. Çav dibêşîn, dilan bikêf lê dida û hestê neteweyî digimijî. Li ser vê atmosferê û rewşê bêguman rola Newroza li welat û li seranserê cihanê jî dihat dîtin. Rojêkê berê MED-TV bi awayekî zindî şahî û pîrozbahiyên Newrozê weşandibûn. Li salonê çavên her kesî mabûn li semînerdarên li ser dika axaftinê. Semîner li ser Kongreya Neteweyî bû, ji aliyê Komela Kurdistan Aware ve hatibû lidarxistin. Di nav semînerdarên de Serokê Komeya Rêveber a PKDW'ê Zubeyir Aydar, Berpîrsê Yekîtiya Niştîmanî Evdîrezaq Feylî, Berdevkê Komela ji Rojhilat Hesen, yê Hizba Sosyalist ji Başûr Eta Serawî, yê Partiya zehmetkêşan Heme Ewat, şexsiyetên navdar mîna Şêx Îzedîn Huseynî, Dr. Mehmed Osman, Selah Muhtedî, Dr. Kemal Elî û Burhan Fayîq hebûn.

Li Stokholmê li cihê ku kurd ji her derê bêhtir dihatin rexnekirin her kes bi rastiyekê dihesse ku hejmara çalakîyên hevbeş bi salên buhurî re nayê muqayesekirin. Di semîner û civînên cur bi cur de ku ber bi mehên dawî de yek li pey ya din tê û bêwestan xelk di wan de beşdar dibe, di meîjî û dilê kurdan de sînorên ku dijîman çêkirine, hildiweşin. Kurdûbûn û neteweyîbûn geş dibe. Zarava û devokên axaftinê, cudatîyên siyasî û felsefî, mehabadîbûyîn, silêmanîbûyîn, qamişlokîbûyîn û amedîbûyîn êdî ne asteng, lê belê dewlemendî û reng in. Hêdî hêdî bi mentalîte û zihniyeteke neteweyî re zimanekî standart jî çêdibe. Zimanekî ku her kes tê digihê û her kes hez jê dike. Hin kes hinekî bi henek jî be jê re dibêjin sormancî. Êdî kurdên cur bi cur hevdu ne ji kitêb û nivîsandînen rojhilatnasan, lê belê bi dengên hev, bi awayekî bi xwîn û goşt, bi rengêkî pendî û konkîret nas dikin. Tablo û dîmena semînera 22'yê adarê çendî tu bibêjî neteweyî bû û ew çendî jî bi dilê beşedarên bû. Gelek kesan ji çavên xwe bawer nedikir, ji kêfan re lîngên wan êrd nedigirt û kêfxweşiya wan ji çavên wan dihat xwendin. Lewre li ser rîya yekîtiya neteweyî gaveke din dihat avêtin û xewna wan dibû heqîqet.



**Ma qey bingeha şanoya me jî tune ye?  
Bêşik heye! Kosegelî yek ji wan e. Ji ber ku  
nivîskarên me yên xurt di vî warî de tune ne,  
ev nîrxên hêja ku di nav gel de bûne delalên ber dilan, di  
çarçoveyê de mane û lewre şanoya kurdî nebûye  
şanoya gel û cîhanê. Ev pirsgerêka sereke ye.**



*Gelo sedemeke we ya taybet heye ku we navê tiyatroyê Hêvî daniye?*

□ Belê, sedema vê yekê ev e ku navê listika me ya yekemîn "Hêviya me hûn in" bû, lewre jî me ev nav ji xwe re guncav dît. Di vê listikê de, jiyana xortekî kurd ku li metropolê hatiye dinyayê, tê pêşkêşkirin. Piştî ku me ev listik pêşkêş kir, tevî pêşniyazên temaşevanên xwe me ev nav li koma xwe kir û navê şanoya me jî bû "Şanoya Hêvî".

*Hevalê Gafûr em dixwazin hûn, ji damezirandinê heta îro qala şanoya Hêvî ji me re bikin.*

□ Şanoya Hêvî di sala 1994'an de, bi vekirina şaxa NÇM'ê ya İzmirê dest bi kar û xebatên şanogeriyê kir. Van rojên ku em tê de ne, Şanoya Hêvî 4 saliya xwe qedand û kete sala xwe ya 5'an. Me bi 60 kesan dest bi xebatê kir. Lê piştî merhaleyêke dûvedirêj hejmara me ji 60 kesan dakete 15 kesan. Bi van 15 kesên bijarte, êdî ji bo ku em û gel bîr cem hev ango ji bo pêşkêşkirina listikên şanoyî, me da nav xebatê û em bi şev û roj li senaryoyên cihêreng ku di hemûyan de hîn dîmen ji jiyana kurdan hene, hûr bûn. Lê beriya wê em di merhaleyêke ku ji 6 mehan pêk dihat re, derbas bûn. Di vê demê de, bi tenê em bi xebatên teknîkî yên bo şanogeriyê û şanoya gerdûnî û hwd. rabûn. Piştî me dest bi xebata bo pêşkêşkirina listikan kir.

*Di vê merhaleyê de hûn ji şanoya cîhanê sude werdigirin an na? Heger tu şanoya cîhanê û şanoya kurdî bidî ber hev tu yê çî bibêjî?*



□ Dema em li şanoya kurdî dinêrin, em dibînin ku tiştên wê yên taybet hene. Aliyên şanoya kurdî, ku ji şanoya cîhanê diqetin bi awayekî zelal xwe didin dest. Mixabin rastiyeke din jî ev e ku, em şanoya kurdî di dîrokê de nabînin. Di dîrokê de em şanoya kurdî cara yekem li Komara Mehabadê dibînin. Ew jî ji bo demeke pir kin e. Di serdema Mehabadê de, listika bi navê 'Dayika Niştiman' nêzîkî 6 mehan tê pêşkêşkirin. Rast e, divê şano bi şoreşgerî bê kirin, lewre di şanoyê de taybetiyên rêberî ji bo civakê zêde diyar û berbiçav in. Şano jiyana mirovan bi xwe ye.

Wekî me berê jî got, bingeha şanoya kurdî gelekî berhemdar e, lê qels û lawaz maye. Ji bo ku em ji xwe re terz û şewazeke nû peyda bikin, me berê xwe da şanoya cîhanê jî. Îro em ji şewaza dramatîk bigirin heta şewaza epîk em ji gelek şewazan sude werdigirin.

Em gelek bi hûrbîni li ser ekola Bertolt Brecht radiwestin û pirtûkên wî dixwîn. Me gelek jê sude wergirt lê em zêde di bin bandora şewaza wî de jî namînin.

*Şewaza wî çî ye?*

□ Terza Brecht epîk e. Di vê terzê de tîgînên sehne û listikvaniyê zêde ne diyar in. Listik bi temaşevan re pêk tê. Bi kurtahî sehne û temaşevan ji hev ne cuda ne di vê şewazê de.

*Dema mirov li Kurdistanê dinihêre, di warê hunerê de cudatîyên gewre di navbera hin herêman de hene. Wekî mînak li herêmekê muzîk pêşkêşî ye lê li herêmekê din jî, ji bo kesên bi karê muzîkê re radîbin dibêjin "ma qey tu mitirb î". Ango li cîhekî jin û mîr ketine milê hev û dîreşîs, li cîhê din bêdengîyek heye. Gelo li gori we sedema vê yekê çî ye?*

□ Bêşik em dikarin bibêjin ku di çanda kurdî de hunera herî pêşkêşî muzîk e. Sedema vê yekê jî dengbêj bi xwe ne ku bi sedan sal bindestî û zordariya serdestan û dîlşahî û xemgîniya civakê anîne zimên. Me di destpêkê de gotibû ku şanoya kurdî qels û lawaz e. Ez dixwazim hinekî vê gotina xwe sererast bikim; şanoya kurdî heye ne ku tune, lê mixabin nehatiye bikaranîn. Bi awayekî zanistî nehatiye nivîsîn û arşivkirin. Ji ber ku wejeya kurdî ya nivîskî pêşkêşî ye.

# Lîstikvanê Şanoya Bingeha şanoya berhemdar

Mesela çand û şanoya cîhanê ango çanda Yewnanî ku jê re çanda Hellenîstîk ango antîk tê gotin; li ser mîtolojiyan ava dibe. Li Yewnanîstanê bi hezar salan e ku şahiyên Diyanîsûs çêdibin. Wekî din berî zayîna Îsa bi 3000 salî bi navê Xwedayê Hilberîne Tamus mîtosek heye. Mîtosên bi vî rengî ji hêla nivîskarên wê demê ve hatine nivîsîn û piştî jî ev nivîs bûne şano. Dema wisa be, bêguman wê şano jî, huner jî bi pêş ve here. Cudatiya me û cîhanê ev e. Ma qey bingeha şanoya me jî tune ye? Bêşik heye! Kosegelî yek ji wan e. Ji ber ku nivîskarên me yên xurt di vî warî de tune ne, ev nîrxên hêja ku di nav gel de bûne delalên ber dilan, di çarçoveyê de mane û lewre şanoya kurdî nebûye şanoya gel û cîhanê. Ev pirsgerêka sereke ye. Pirsgerêka duyemîn jî bandora dîn (ol) e.

Mesela li gori dîn, textîtkirina (bizarîkirin) kesan xeslet û guneh e. Lewre di şanoyê de bizarîkirin ango textîtkirî bi pêş neketiye. Ji bo hunerên dîtarî jî herman helwest hatiye girtin. Li gori baweriya dînî tê gotin ku: "Dema tu wêneyekî çêbikî, tu mecbûr î ku li axiretê wî wêneyî bi can bikî." Di baweriya îslamiyê û dînen dîn ên heq de jî ji bilî Xwedê tu kes nikare vê yekê bike.

Li Kurdistanê di dawetan de, di ser-salan de û di şahiyên de jî ji bilî Kosegelî bi navê 'Qirdîk û Mirdîk' listîk hebûn. Bi taybetî ev listîk, li herêman Mêrdîn û Xerzan, Kosegelî jî li Serhedê tê listin. Wekî din listika 'Kalîk û Fatîk' jî li Amedê tê listin. Lê ne bi awayekî zanistî, bi amatorî...

*Gelo tu dikarî bibêjî li cîhanê himda-*

*rê şanoyê ev kes e an jî li Kurdistanê kesek heye ku wekî himdarê şanoyê tê bi nav kirin?*

□ (Dikene) Bi rastî jî bersivandina vê pirsê gelekî dijwar û zehmet e. Lewre jî ne ez û ne jî kesekî din dikare bersiva vê pirsê bide. Ji ber ku em xwe di vî warî de nû dibînin, ez nikarim vê pirsê biber-sivînim.

*Îro Romeo û Julieta îngilîzan heye. Gelo Kawayê kurdan jî nikare bibe mijareke wekî Sheakespeare? Ango Romeo û Juliet jî destana Mem û Zînê bêhtir bi tesîr e ku hew qas navdar bûye?*

**Kêmasiya me ya din jî nebaş bikaranîna zimanê kurdî ye. Ji bo ku tu Memê Alan an jî Zîna Zêydan bilizî, pêwîst e ku zimanekî te yê şahîk û karîger hebe. Divê tu bi wî zimanî Zînê bidî jiyandin. Wekî mînak; gelo kesên ku li filmê Mem û Zîn temaşê kirin çiqas jî wan gotin "Ev Mem û Zîn e?"**





# Hêvî Gafur Doğan: Şanoya kurdî şandare

□ Bêguman Sheakespearê me û Romeo û Julietên me jî hene...

*Kî ne?*

□ Sheakesperê me Ehmedê Xanî ye. Îro berhemên wî ketine nav literatûra çand û wejeya cihanê. Di destan û berhemên wî de, felsefeyeke gelekî mezin heye. Ji bo ku Mem û Zîn a Ehmedê Xanî bibe Romeo û Juliet, divê derkeve ser sehneyê jî. Kêmasiyeye me ya din jî nebaş bikaranîna zimanê kurdî ye. Ji bona ku tu Memê Alan an jî Zîna Zêydan bilîzî, pêwîst e ku zimanekî te yê şahîk û karîger hebe. Divê tu bi wî zimanî Zînê bidî jiyandin. Dixwazim mînakekê bidim; gelo kesên ku li filmê Mem û Zînê

temaşê kirin çendan ji wan got "Ev çiroka Mem û Zînê ye?"

*Li gorî we divê şanoya kurdî li ser bingehên çawa pêk were?*

□ Di destpêkê de divê şanoya kurdî bi hestên kurdayetî û neteweyî bê afirandin. Qey em ne kurd in? Belê em kurd in lê divê em jixwe bipirsin: "Gelo em çi qas Kurdistanê dinasin? Dema tu bixwazî li ser Çemê Dicleyê helbestekê binivîsî, heger te Çemê Dicleyê nedîtibe, dema tu bixwazî çem di ber çavê te re derbas nebe û tu ne li kêleka wê bî, tu nikarî hestên xwe bidî helbestê. Rast e, ev astengî mezin in û rê li ber xebatê digirin. Lê em nikarin xwe biavêjin bin vê

perdeyê. Jiyana me ya li metropolan divê ji me re nebe hincet. Pêwîst e li van deran, li dûrî welêt jî xebata çandî bê kirin, nîrx û berjewendiyên ku bi sedan sal têne tunekirin û dizîna bêne parastin û pêşkêşî gelê kurd bînin kirin. Lewre jî divê wekî her şaxên hunerê şanoya kurdî jî li ser vê esasê şîn bibe.

*Bêguman şanoya kurdî ne wekî 10 sal berê ye. Ev deh sal in ku pêşketinên heja di vî warî de çêbûne. Hûn dikarin bibêjin ev pêşveçûn bi saya Têkoşîna Rizgariyê çêbûne?*

□ Baweriya min ew e ku îro li welatê me û li derve, ji her alî ve jiyana kurdan bi têkoşîna rizgariya gelê Kurdistanê ve girêdahî ye. Em dikarin bibêjin ku şanoya kurd a modern, li Bakur piştî avakirina NÇM'ê derkekiye holê. Ji ber ku NÇM berhemê têkoşînê ye, rasterast têkiliya şanoyê bi têkoşînê re xwe dide der. Şanoya ku me berê dikir ji hêla teatralî û teknîkî ve qels bû. Kêmasiyên mezin hebûn. Zêdetir listik dişibayan listikên ku li gundan di odeyan de dihat listin. Lê di sê salên dawî de xebatên çak û heja pêk hatin. Cara yekem bi navê 'Rojbaş' listikeke tîrtîjî ji hêla Teatra Jiyana Nû ve hate pêşkêşkirin. Peyre Şanoya Hêvî di herman astê de listika 'Simûrg û Ronahî' raber kir. Piştî 'Sê Ewrên Dûr-Ta', 'Generalê Teneke' û cara dawî jî 'Komara Dînan: Şermola' ku ji pirtûka Helîm Yûsîv hatiye wergirtin-gavên gelekî girîng û heja ne di warê şanoya kurdî de. Bêguman em dikarin vê merhaleyê wekî "Şoreşa Şanoya Kurd" bi-nav bikin. Gelo ev bes e? Na ne bes e. Divê gavên bastir bêne avêtin.

Bi kurtasî ez dikarin bibêjin ku têkoşîna rizgarî ya Kurdistanê, rê li ber hunera kurdî jî vekirî ye ji ber ku qereqolan di mejiyan de hildiwesîn. Di vî warî de MED TV mînakeke girîng e.

*Heta niha hûn bi çend listikan derketine pêşberî gel?*

□ Ji destpêkê heta niha em bi 13 listikên dirêj û ji kurtelîstikan derketine pêşberî gelê xwe. Ev listik bi rêzê ev in:

✓ **Hêviya Me Hûn in:** Li ser jiyana xortekî kurd ku li metropolê dijî ye. Naveroka vê listikê li ser pîrsgirêka leşkeriyê ya xortên kurd e.

✓ **Di Çîna Dinê de Nêrîneke Ritûel:** Di vê listika de mijar lihevparikîna Kurdistanê ye.

✓ **Apê Musa:** Ev listik, ji bo bîranî-

na Apê Musa hate amadekirin.

✓ **Name:** Li ser grevên birçibûnê ye. Nameya girtiyekî ku ji dayîka xwe re şandiyê bûye mijara vê listika me.

✓ **Qêrînên Bêdeng:** Ji bo bîranîna Komkujiya Helebçeyê me ev listik amade kir.

✓ **Simûrg û Ronahî:** Listika me ya ku herî zêde, li dora 6 mehan, em li ser sekinîne. Divê listikê de pîrsgirêkên neteweyî ku di kesayetiya rewşenbîrên kurd de xwe didin der, derketine pêş.

✓ **NÇM: Qêrîna Sê Hezar Salî:** Ev kurtelîstik e. Piştî ku NÇM'ê li Îzmîrê ji hêla hêzên tirk ve hate girtin û deriyê wê hate morkirin, wekî bersiv me ev listik amade kir û me got NÇM, qêrîna sê hezar salî ye û nayê birîn. Li HADEP'a Konakê li Fuara Ekiciöverê, li sikaka ber NÇM'ê, li Evrensel Kültür Merkezi û li kolan û dawetan me ev listik ji bo protestokirina dewletê pêşkêş kir.

✓ **Rodî:** Li ser pişaftina zimanê kurdî ye. Di malbatan de, dê û bav çawa xwe bi xwe dikin ku zarokên wan ji zimanê zikmakî dûr bikevin, bûye mijara vê listikê. Tiştê balkêş ev e ku, dê û bav di sohbetên xwe de bi dizî be jî bi zimanê kurdî dipeyivîn, lê bi zarokên xwe re tirkî dipeyivîn û dixwazin zarok jî bi tirkî dipeyivin.

✓ **Sistema Cihana Nû:** Di vê listikê de, gelê kurd bi projeyên çawa têne koçberkirin, kurd çawa ji hev têne veqetandin, fen û fûtên çawa pêk tên, baş tîna zîmên.

✓ **Qeşmer û Pêşmer:** Ev listik ji bo zarokan e. Em dikarin bibêjin ku ev di şanoya kurdî de 'Palyaço ya (Qeşmer)' ya yekemîn e.

✓ **Kawayê Hemdem:** Ji bo salvegera 15'ê gelawêjê (Mazlum Doğan)

✓ **Gurî:** Listika karakterekî gelêrî ye kurd e. Wekî tê zanîn Gurî di nav civaka kurd de bi navê 'Keçelo' û li Anadoliyayê jî wekî 'Keloglan' tê nasîn.

✓ **Lîrîna Aso:** listika me ya dawî ye. Ev mehek e ku li Îzmîrê tê listin. Listika ku wê di 4'ê avrêlê li NÇM'a Stenbolê bê pêşkêşkirin, li ser aşî û zilma li ser gel û trêna aşiyê ye. Di vê listikê de der heqê aşiyê de hin derdor û şexs çî dayik be, çî leşker û xwendekarên kurd û tirk bin, der barê aşiyê de çî difikirin baş berbiçav dibe.

HEVPEYVÎN: SALIHÊ KEVIRBIRÎ



Şanoya Hêvî (Listika Gurî)



**R**abû ser xwe û bêhneke fireh stand. Solên xwe xistin lingên xwe û qeytana wan girêda. Zencîra şal û montê xwe kişand. Çend caran lingên xwe li erdê xistin, wekî riyeke dûr û dirêj li pêşiya wî be, her derê xwe rast kir. Serê xwe rakir û wênayê birayê wî, ku li dîwarê li hemberî wî bû, nihêrî û xeyaleke kurt di hişê wî re derbas bû û got: "Erê birawo, ez jî tîm, weleh ez tîm. Ez ê jî rizgar bibim, ez ê jî azad bibim wekî te."

Derket derve, careke din li xaniyê xwe nihêrî û berê xwe da Qerejdaxê. Wekî bazdankarekî profesyonel ewilî bi gavên biçûk û sivik sivik lingên xwe bi erdê dikir û baz dida. Li aliyekî jî di ber xwe de dipeyivî û digot: "Ez ê herim, weleh ez diçim rizgariyê, tu kes nikare min bisekinîne."

Lê carinan raborî û dimenên zarokên wî dihatin bîra wî. Wê demê gavên wî sist dibûn û hêza wî kêmtir dibû. Lê dîsa bi xwe re dixeyidî û digot: "Ez ne mirovekî dewlemend im ku li ber milikên xwe bikevim, ez ne mirovekî pir-peyv im ku di nav peyvên xwe de bifetisim, ez ne mirovekî kone me ku bidime çiv û dûvan? Navê min Baqî ye lawo... Ez birayê şehîdan im, diwazdeh hezar gul, di dilê min de şewitî ne. Ez ê çawa ji bîr bikim? Ey lingo! Xwe sist neke. Ji bo çî tu li paş dimînî? Qey nayê bîra te ew jopên bi qirêj? Nayê bîra te birêveçûna ser xwe, nayê bîra te cemedê hûrkirî û ava cemidî? Roj roja te ye îro lingo! Xayintiyê li min neke lingo...!"

Her diçû hê dilezand. Gavên wî mezin dibûn. Gome lêmist û devî li ber wî biçûk diman. Xuya nedibûn êdî dirî û kelem. Di ser wan re gav dikir û pêlên bê diqelaştin. Hinekî difikirî û hişên wî dihatin serê wî, piştî ew hiş dibûn hêz û xwe bera dilê wî didan, kela dilê wî gur dibû û ling dibûn lingên pilingan.

Li paş mabû êdî jiyana bêrûmet, li paş mabû jiyana bêrehm, li paş mabûn zikakên Şemrexê, li paş mabû êdî kaxizên listîkê li ser maseyên çayxaneyê. Ne meaşê dewletê pere dikir, êdî û ne bi wan pereyan kirîna mal û milkan. Giş ji pêş çavan çûbûn, êdî herifibû rûmeta wan. Tenê bazdan hebû, tenê serxwebûn, tenê evîna rizgariyê, tenê hêviya azadiyê mabû li pêşiya wî.

Carekê ji nişka ve xeyala zarokê wî li ber çavan xuya bû, got: "Gelo ev xeyal e an na?"

Lê dîsa jî wekî ku dengê wî here wan, got: "Hûn li vir li çî digerin, ji min re ne bine asteng. Ger hûn bibin asteng, ez rizgar nabim. Ku ez rizgar nabim, hûn azad nabim. Hûn di dilê min de ne, ez we ji bîr nakim. Hûn jî min ji bîr nekin."

Wekî dengê ji nava wan jî hat: "Em heta dawiyê bi te re ne..." û wî wîndabû.

Demekê sekinî Baqî, xwîn lê sar bû û jiyana 17 salan ku bi zarokên xwe re derbas kiribû, hate bîra wî. Wekî ramana vegeirê kete serê wî, bêhnekê fikirî û got:

- Lê hingizên bi bizmar, lê güleyên

xwînmijan, lê diwazdeh hezar gulên çilmisî?... Lê lehengên li benda min...? Lê hêstirên dayika min...? Lê qêrînen zarokên Helepçeyê...? Lê satoreyên qeseban...?


Na...! Na...! Ez venagerim! Ez venagerim...! Li min binêrin, tahtino, li min binêrin darino, li min binêrin ewrino...! Li min binêrin û guhdar bikin; bi soz û peyman, bi ala rengîn, bi takên rihaxê Şêx Seîd, bi keleşa ser sînga Cesûr, bi şerefa şoreşgerî, bi serê Orhan û Serap...! Ez sond dixwim, vegeir tune ye ji min re... mirin heye lê vegeir na...!

serxwebûneke bi rûmet, bawer bike, em wekî hev in, çemo..."

Xwe amade kir ku derbasî qiraxa çemê din bibe, devlingê pantorê xwe vemilandin, solên xwe ji pê kirin û da nava ava cemidî. Hate nêzîka perê din, gava xwe avêt ku derkeve, lê ji nişka ve lingê wî şewitî, got qey li kevir ket. Lê her diçû hê pir dişewitî. Nihêrî ku xwîn jê tê. Xwe da ber lêmiştê perê çemê û rûnişt. Li lingê xwe nihêrî, xwîn pir jê dihat. Got: "Ev çî bû li lingê min ket?" Li dora xwe nihêrî, îcar got: "Dibe ku kelem an cam be." Lê tu tişt li şopa wî tu-

kor...! Tu bûyî qey, yê min bisekinîne? Tu bûyî, yê min ji riya min vegeirîne? Ma min çî bi te kiriye, ey marê xayîn? Ev axa ku ez ê ji bo wê bimirim, qey tu jî lê najî? Bi Xwedê tu xayînî loo...! Bi Xwedê xwîna kontrayan bi te geriyaye. Bi Xwedê tu ji nav ava qirêj derketiye. Ez tu carî namirim... Ezê tim bimirama, lê te mirineke bi rûmet ji min re anî, mirineke bêmirin....

Lê tu? Tu yê di nava ava ku tu jê hatiye, ewê ava qirêj de bifetisî. Lê ez...! Ez ê herim ba kekê xwe.. Ez ê herim ba Cesûr, Merwan, Omer, Cûma û Çekdar...



# Mirina bi rûmet

Bazdana wî dîsa dest pê kiribû. Bi hêzeke nû, bi paqijiyê mejiyê wî û sivi-kahiya laşê wî bayê Qerejdaxê dihatê birîn. Hênik dihat bêhna azadiyê...

Di hişê wî re derbas dibû welatê azad û serbixwe, dibistanên bi kurdî, televizyon û pirtûkên bi kurdî, şahiyên kurdî, rojnameyên bi kurdî û alên rengîn. Hukumeteke mirov hez û mirovên mirovhez. Giş yeko yeko dihatin bîra wî. Vê jî hêza wî hê pir dikir.

Hate ber çemekî, bazdana xwe kêmtir. Li ber çem sekinî û got:

- Ey çemo çemê bêdawî?... Tu ji wekî min bindest î qey, ewqas leme lem û şûre şûra te yî? Ew qas qêrîna te ji ber çî ye? Li pêşiya te derya, li pêşiya min ji

nebû. Carekê ji nedîti ve marekî reş di ber re derbas bû û wîndabû. Tirsa ku di dilê wî de bû rast derket. Mar bi lingê wî yê çepê veda bû. Serê xwe hejand û got:

- Îcar ez ê çî bikim? Ev ji ku derket, hê riya-min jî pir maye? Ez ji bajêr jî bi dîr ketim, nikarim vegeir jî. Lewre min sond jî xwariye."

Devê xwe dirêjî birînê kir ku xwînê bimêje, lê nedibû. Bi her du destên xwe birîn guvaşt û xwîn jê derxist. Belê her diçû laşê wî giran dibû. Li ber çavên wî rewrewk çêdibûn. Hewl da xwe ku rabe, lê nikaribû. Xeweke giran xwe bera ser çavan dabû. Dev ji birîna xwe berda. Bi awayekî westiyayî, xwe dirêj kir, li ber lêmiştê û di ber xwe de got: "Ey marê

Ez ê bibime mêvanê Metîn, Silêman û xwişka Emîne... Lê tu yê li ku bî maro...! Weleh tu yê tim birçî tazî û perîşan bî, te tim xayîn bî, tu yê tim di nava ava qirêj de avjeniyê bikî û hetanî tu di nava wê avê de bifetisî?"

Xwe li ser erdê dirêj kiribû, tevger tê nemabû. Qêrîn dihatin guhên wî. Wekî qêrîna Serap. Lê ne qêrîna yekê tenê bû. Her diçûn qêrîn pir dibûn. Digot: "Mirov qey mirov li pey min tî." Cara dawîn fikirî:

- Heke mirov wiha li pey min werin, wê meşa min bidomînin. Ez bimirim jî, êdî ne xem e!"



Li şaxa Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 29 adar 1998 Yekşem:

Koma Vengê Sodinî, wê bi konsera xwe ya ku bi piranî ji stranên dimilkî pêk tê, derkeve pêşberî gel. Saet: 14:00

Ji Teatra Jiyana Nû listika bi navê :Komara Dînan: 'Şermola', saet: 17:30

30 adar 1998 In:

Film- Holik (Baraka) Derhêner Ron Feicke

"Mirov...xweza...ol... makîneyibûn... çalakdariya bêdawî... belgefilmê ku behsa tevahiya van xalan dike, li 22 welatan hatiye kişandin, saet: 18:00



4 adar 1998 Şemî:

Pêşandana DîA'ye "Li Çiyayê Munzurê"

Amadekar: Îsmail Batî, saet: 14:30

Şanoya Hêvî: (ji NÇM ya Îzmîrê) Lîrina Aso. saet: 17:30

MEDKOM

29 adar 1998 Yekşem:

Konsera piştigiriyê ku ji aliyê xwendekaran ve tê organizekirin, saet: 14:00

## Û kuştina Olof Palme bû film

# "Peymana dawîn"

Rûpelên demsalê, payîza paşîn 1985 nişan dida. Li lokalên krîmînel li Kungsholma Stockholmê plan û projeya kuştina mirovekî di rojevê de bû: "Divê ew ji holê bê rakirin."

Piştî du mehên din. Rûpelên demsalê, vê carê, nivê reşemiya 1986'an nişan dida. Komek terorîstên rastgir, ku ji polis û serleşkeran pêk dihat, civînek li dar xistibû. Biryarek hatibû dayîn. Hemû kes kêfxweş bûbûn.

Sînyala girîng, di 28' reşemiya 1985'an de hatibû şandin: Olof Palme, bi pîreka xwe re dê here sînemayê. Wî parêzkar nexwestiye. Amadekariya kuştina wî bi zûtirin şeweyî ke te dewreyê.

Organizasyona rastgir, wê rojê li telefonên wî guhdarî kiribû. Wê rojê polisên rastgir, nobet girt ku tu şop li pey wan nemîne. Saet 20.35 bû. Palme û pîreka wî, li lêsiwargeha (durak) Radmansgatan peya bûn û berê xwe dane Sînema Grandê. Li derve kesek li benda wan bûn. Hevalên wî, bi bêtêlê pê re qise dikir û agahiyên li ser kolanan didane wî.

Da-wî li

filma hatibû, hemû kes derketibûn derve. Dora wî hatibû pêçan û şensê wî qet tunebû ku ji mirinê rizgar bibe. Ew mirov û çend kesên din ji çar aliyan didin dû-wî. Kujer nêzik dibe. Palme jê dikeve şikê. Gava dixwaze lê vegere, mîrkuj çeka xwe ji ber xwe derdixe û ji aliyê piştê ve berdide Palme. Wî, du ber (gulê) berdabû Palme. Pîreka wî ziravqetandî bûbû. Kesê mîrkuj, di nav reşê de şopa xwe dabû windakirin.

Derengê şevê ye. Agahiya kuştina wî digihêje hêza terorîst. Serpolîsek, ku bi dîtinên

xwe yê faşîstî tê nasîn, li ber telefonê rûdine û mizgîniya kuştina wî dide tevayî hevalên xwe. Ew wê şevê, şuşeyên şampanya û şarabê vedikin û iskanên xwe ji bo kêfxweşiya kuştina Olof Palme radikin. (Ji pirtûka Mor-det

pa Olof Palme - KPML - Göteborg) Olof Palme, Serok Wezîrê berê yê Swêdê bû. Ew sêbola aştîxwaziye bû. Di dema şerê Wîetnamê de, derketibû kolanan û piştigiriyê xwe ji bo gelê Wîetnamî ragihandibû. Ji bo çareserkirina pîrsgîrê kurdistanê jî, bi dîtinên xwe yê aştîxwazane bala gelê kurd kişandibû ser xwe. Ew dostê gelê kurd bû. Kurdan jî pir jê hez dikir.

Belê li ser jiyana wî kesê hêja hejmarek pirtûk hatibûn nivîsandin. Niha jî çîroka kuştina wî, bû film. Sînamegerê Swêdî, Kjell Sundsvall ev berhem anî holê. Navê film "Peymana dawîn", an go "Sista Kontraktet" e.


Di van rojan de, li îskandinavaya û li gelek deverên din, li sînemayan tê nîşandayîn. Li Swêdê berî niha bi mehekê xelkê bilêten xwe kirin û cihê xwe veqetandin. Li gorî ku rojnemeyên çandî û hunerî qal dikin, film li çend deverên Amerikayê hatiye nîşandayîn û bala xelkê pir kişandiye. Ji bilî Amerika, Almanya bû kiryarê (alıcı) yekem û film li wir jî kete rojevê. Li tevayî Amerika û Japonyayê, gelek şirketên mezin dixwazin ku wî filmî bikirin û bidin nîşandayîn. Li gorî agahyan ji bo çekirina film 20 milyon kron hatiye xerckirin.

Listikvan: Mikael Persbrant, Michael Kitchen, Pernilla August, Reine Brynolfsson.

GABAR ÇIYAN/ SWÊD

TÎŞK

## Tê miyan de



LERZAN JANDÎL

Rojeve hênî rew vurîna, ke roje esta ke mordem nêzane çinay ser ro binivîsno. Aşma martî aşmêde tewr pir a. Newroze, Halepçe, şarewêrdardayenî, îxanet, dostiye, dişmentiyê pêro na aşme de estê. Na aşme de şarê ma Newroza xo ebi şewqêde girs pîroz kerde. Sera mawa newiye Newroza şarê ma pîroz bo. Na aşme de roje bimbarekî zaf ê. Hawtemalo qij, newê martî; Hawtemalo girs û êb. Pêro şarê ma rê pîroz bê. Na aşme de belgeyê herketê Enfalî, herketê leşkeriyê yê Sadamî amê çapkerdene. Ganî mordem Helepçe xo vîra mekero. Şarê ma ganî qe xo vîra mekero! Na aşme de sarewêrdardayena tewr dîrokiye Gurtgahê Amedî de biyê. Kawayê hemdemî, M. Doğanî na aşme de merdene de weşiyê vîraştê. Nê çiyê dîrokiye balkêş û ebi qedrê. Kaleka nê çiyên de çiyê nêweşî jî na aşme de benê. Ez nînan re yew çî ser ro vindena:

Roja 13.01.1998 de, bonê/banê Parlameta Berlîn de yew pêseramayene/kombiyene viraziye. Na pêseramayene Îsmail Hakki Koşanî organize kerde. Name na pêseramayene "Berlîn de Zazayî-Dîroke û kulturê ye şarê Anadolîaya Rojhilatî." Mordem ke zaf pozîtîf bikiriyo vaco; "Ma naye de çî esto. Mordem ke xo zaza vînenê û wazeno xo bido naskerdene, no çiyê de normal o. Mordem ke xo zaza vînenê û wazeno xo bido naskerdene, no çiyê de normal o." Hêya eke mesele na bo, raşt a. Eke yew mordemê de kirmanc xo zaza, xo alman, xo tirk bivîno ez bi naye normal vînenê. Raşt nêvînenê, la belê normal vînenê. Çimke halê şarê ma meydan de ro, tesîrê koledariyê werde de ro, îzahe naye psikoloji de, asîmfilyasyon de, şexsiyetê xo qij diyene de esto.

La belê mesele niya niya!

Ma vacîme, ke Îsmail Hakki Koşan xo zaza vînenê û wazeno xo bido naskerdene. Rind, o taw ganî Îsmail xo bido naskerdene. Vaco, o kam o? Kultur û dîoraka dînan çik a? La belê raştîye de Îsmail xo nidano naskerdene, xo ebi mordemanê bînan dano naskerden. Ma vacîme; ke na jî normal a. Ma nê kesî qeyî pêro eynî fikrê de rê? A jî beno. Ma nê mordemî qeyî pêro dişmentiya Kirdasiyan 'kurdan' kenê? Dişmentiya şaftiye kenê?

Ha, naca ganî ma vînderîme, telika xo verê xo de ronîme û bifirime! û Îsmailî ra bipersîme: "Ti jî zana, ke derheqê kirmancan de spekulasyonî vatî? Eke mordem derheqê kirmancan de çiyê de bêhet, objektîf virazeno, ganî vengê her hetî bido. To qeyî vengê yew hetî/fikirî, yê ke xo zaza vînenê û dişmentiya kirdasiyan kenê da? İdî niya seyran niyo, zameyê mi qeyî mi paç kenê!" sebo ke ti bê îdî/roşene û bê seyran zazayan paç kenê çik o? Qeyî to teyna Zilfî Selcanî, Hakki Çimenî û Kemal Karabulufî silaynena? Qey seba zazayan ra teyna nê hîrê kesî otorîte yê? Yan jî zazay teyna Tunceliye de estê? To hetanî nika kirmancan re se kerdo? Qaso ke to tirkan re xizmete kerda, to kirmancan re jî kerda? Her çiqê ke ti Dêrsim ra biya, hetanî nika qeyî Dêrsim ra biyena tu niyamê to vîrî?

To qe hetkariya kesane ke ebi pratîkê xo xizmeta kulturê zazayan' kerdo, kerda? eke tu kerda, kamî rê? eke to nêkerda qeyî? Seba domanenê kirmancan to se kerdo? To qe hetkariya karê seba domanenê kirmancan kerdo? To hem komelanê alevîyan re heqeret kena, hem jî avakerdana Akedemiye Alevîyan xebetîna? Ti naye se îzah kena?

To zaneke nêzana kêmasiyê de to ya, ganî bîmusê- ke şarê mayê. Dêrsimî xo ra vano 'kirmanc' welatê xo ra vano; Kirmanciyê û zonê xo ra vano: Kirmancî. To na zaza tenî kotî ra vete? To qeyî uca reaksiyon nêmusnu, tawo ke dewijêde Dêrsimî vat ke: Ma kirmanc nîme, ma zazay me". İhtiyaciya to bi fikrê û bawariya dewijêde nesamimî biye?

Ganî to-şima cewabê nê persan ebi nivîs bi derê ma!



Amadekar: ROŞAN LEZGÎN, RAMAN ÇAKAR

## HEVALÊN HÊJA,

WE hemûyan bi silavên welat-  
parêzî silav dikim û serfirazî ji  
we re dixwazim. Kekoyê min  
Muradê Sirucê ez hînî xwendin  
û nivîsandina kurdî kirim.  
Bi zimanê şêrîn xwendin û nivî-  
sandin çî xweş e.

Hêviya min, zarokên wekî  
min kurd di dibistanên kurdî de  
hînî xwendinê bibin. Hevalno  
daxwazê min ji we heye; ji bo  
zarokan pelgê veqetînin ez û  
zarokên wekî min wê kêfxweş  
bibin. Biminî di xweşiyê de.

Cejna Newrozê li we hemûyan  
pîroz be.

Xwendekarê dibistana seretayî  
Ekremê Sirucê



## Tiştonek

Tiştê tiştonek  
Kevirê siltanek  
Ne gur dibe  
Ne diz dixwe.

(Kûsi)

\*Êvarê dangê  
Tijî pez dikim  
Serê sibê yek tê tune.

(Stêrk)

\*Dêza danuyan  
Pišta xaniyan

(Kuna kurmoriyan)

\*Zerî zerî  
Bazda nav derî  
Yê nizane har kerî

(Roj)

\*Tenûra xum xumî  
Tijî nanê genimî

(Kewara mîşên hingiv)

\*Kalo tê ji deştê,  
Komek dirî li piştê

(Jûjî)

\*Hilindir bilindir,  
Law ji bavê bilintir

(Dûyê agir)

\*Hespê şê  
Bazda hewşê

(Çira avê)

## ROVÎ Û HIRÇ



Roviyek pir birçî bûbû. Ji xwe re çû li xwarinê bigere. Pir geriya, tiştekek nedît. Li  
lana (qul, şikeft) hirçê rast hat. Li lanê nihêrî, kutikên hirçê dît. Ji wan xwarin  
xwest. Kutikan jê pirsî: "Gelo tu kî yî?" Rovî got: "Ez bavê we me." Kutikên hirçê  
xwarina xwe giş dan rovî û mamê rovî zikê xwe têr kir. Çû li pişt lana hirçê rûnişt.  
Dema hirç vegeya lana xwe, dît ku xwarin nemaye. Ji kutikên xwe pirsî: "Ka xwa-  
rina me?" Kutikan got: "Bavê me giş xwar, nema." Hirçê ji kutikên xwe pirsî: "Ba-  
vê we yekî çawa bû?" Kutikan gotin: "Yekî dûv dirêj û çav zerik bû." Hirçê fêr kir  
ku, ew rovî ye.

Rabû bi pey rovî ket. Gava rovî hirç dît, berê xwe da nav daristanê û baz da. Hirç  
bi pey ket, rovî reviya. Hirçê li pey baz da, rovî di nav du darên teng re derbas bû.  
Hirç li ser rêça (şopa) rovî çû. Hirç, dema bi hêrs û bi lez, di nav wan her du darên  
teng re derbas bû, laşê wê yê girs û qelew, di nav her du daran de asê (girtî) ma. Wê  
demê mamê rovî, çû li pišta hirçê siwar bû. Û ji hirçê re wiha got: "Tu niha bawer  
dikî ku, ez bavê kutikan im!"

## Nezanok

\*Li gorî hejmara di  
nav kevanê (parantez)  
de li ser hev tekrar kin.

\*Heft baq dezî  
Kuna derziya  
Diya min re bezî (4)

\*Şeş seyê Şero wê  
Şirînsasî şer kirin  
Şer ji şerê her şeş  
Seyê Şero wê  
Şirînsasê  
xweştir tunebû. (2)

\*Qirkê qêrek  
Da qijêkê  
Qijêkê qir kir  
kir qar qar (2)

\*Bivira badayî  
Destê dadê de  
Li derza darê de (3)

\*Te digot  
Gura min gulik e  
Gula gûra (goreya) min  
gulik e (3)



# Jiyana Rewşen derket

Di pêşeka hejmarê 17'emîn a Jiyana Rewşenê de li ser koçberî, penaberî û komkujiyan tê rastwestin û pêwîstiya lixwevegerînê tê destnîşankirin. Li gel vê yekê wiha hatiye nivîsandin: "Çek peyva herî karîger e. Navgîna herbaş e, ji bo gelên ku dane pey dîroka koçberiyê."

"Ez pir ji şoreşê hez dikim. Roj bi roj dixînim testê û ez bi êşa xwe serê wê dişom, wê dişînim serê çiyê, bêriya wê dikim." Helîm Yusiv, van gotinan di hevpeyvîna xwe ya 17'emîn a Jiyana Rewşenê de tîne zimên. Çavpêketin ji aliyê Jan Dost ve hatiye kirin. Yusiv, çêlî mercên xwe yê nivîsandê dîke û dibêje: "Wekî Salvador Dalî, ez dema herdu çavên xwe digirim, bêhtir cihanê dibînim." Ji van mijaran pê ve nivîskar, bersiva yan pirsan dide: "Kurd çima piştî mirinê li ronakbîrên xwe xwedî derdikevin? Rewşa wêjeyî ya Başûrê Biçûk çawa ye? Mercên tîrnavokbûna toreyê kurdî çi ne? Têkiliya şoreş û wêjeyê di vê çawa be? Raman û boçûna Helîm Yusiv bo ekolên wêjeyî çi ye?"

Di vê hejmarê de, helbestên ku di Jiyana Rewşenê de hatine belavkirin, bi giştî serketî ne. Helbesta Kawa Nemir, 'Paşpaşokapêşpêşoka Surrealist' bi şewaz û naveroka xwe balkêş e. Nemir, wekî her car helbesta xwe bi awayekî tînazwer (îronîk) ristiye. Di şewaza Kawa Nemir de, tesîra helbestvanê tirk Can Yücel berbiçav e. Bi taybetî di warê

peyvbazî û atîfan de, ev yekê xwe dide der. Bo nimûne: Zîgotin (zargotin), qeşmerge (pêşmerge), gakovî (pezkovî) û Kurdîstana Nijeryayê. Lê Nemir ne bi awayekî zarîker (textlîtker), bi awayekî xweser helbesta xwe ristiye. Li aliyê din Kawa Nemir bi sernavê 'Paşpaşokapêşpêşoka Surrealist' zimanê eşandiye. Di helbestên Kawa Nemir de, xaleke balkêş jî, bikaranîna peyvên soranî ye. Ev hewl her çend, di destpêkê de li ber şayîkbûna helbestê asteng e jî lê bo demêke dirêj gelekî bikêr e.

Pêwîst e, nivîskar û helbestvanên kurd, jî hemû zarawayên kurdî peyvên di helbestên xwe de bi kar bînin. Ji ber ku peyv di helbestan de bêhtir mayînde dibin. Ev jî, ji bo yekîtiya zimanê kurdî û dewlemendiya helbestê gelekî bikêr e. Ji bilî vê helbestê, helbestên Çiya Mazî, A. Rahman Çelik, Osoyê Selîm, helbestên ji Îngilîzî wergerandi, Adar Jiyan, Cemil Denî, Aravba Jîn, Mirza Îdrîs, Rênas Jiyan û Roşan Lezgîn hatine belavkirin.

Wekî din çîrok û kurteçîrokên ku ji argoya kurdewarî sude wergitine jî bi naveroka xwe balkêş in. Kurteçîroka H. Kovan Baqî, "Gurê Doxînan" û çîroka bi navê 'Çîroka Mele' bi vî şeweyî hatiye ristin. Pêwîst e li dijî vê şewazê reaksiyon nayê nîşandayin. Nêrînen li dijî bikaranîna argoyê elitîst û jakobenîst in. Her wiha çîrok û pêkenokên bi vî rengî di nav civaka kurd de wekî tiştêkî asayî

tên vegotin. Naveroka van berhemana, li ser şikistinên psîkolojîk nehatiye avakirin û wekî civaka kapitalîst nelewitiye. Di vî warî de, ji bo ku aliyên argowarî yê wêjeyê kurd geş û xurt bibin, pêwîstiya amadekirina 'Fehenga Argoya Kurdî' xwe dide xuyakirin.

Refik Incir li ser jîne-nîgariya nivîskar û helbestvanê Swêdî August Strindberg nivîsek amade kiriye. Di nivîsê de digel helwesta wî ya wêjeyî, jiyana Strindberg ya zor seyr jî tê vegotin. Nivîsên bi vî rengî pêwîst in lê divê nivîsên bi vî rengî êdî xwe ji dirûva jîne-nîgariyê dûr bixin û bi awayekî nîrxandî bînin nivîsandin.


Di nivîsa li ser jiyana August Strindberg de, tesîra fikirîna tirkî gelekî diyar e. Bo nimûne hevoka 'Wexta min ew li ser kaxîzê dît, zêde tiştêkî ji bo min dernebir' rasterast bi fikirîna tirkî hatiye sazîkirin. Beramberî 'dernebir' pêwîst e 'ne girîng' bihata bikaranîn. Dîsa di hevoka 'Kare ku navê wî melîk be, an jî serokomar be' de, li şûna 'dibe ku' 'kare ku' hatiye xebitandin. Ev jî xwerû fi-

kirîna bi tirkî ye.

Di vê hejmarê Jiyana Rewşenê de, zêdebûna nivîsên dimilkî ango kîrmanckî jî wekî xaleke erênî xwe dide der. Dewîj Zaf bi sernavê: "Ez kî şorî şona Havramanat", Şengül Par jî bi sernavê: "Terva Xal Saxê" nivîs nivîsandine.

Ji bilî van, di vê hejmarê de ev nivîs balê dikşînin: Geliyê Zilan-Nuray Şen, Osman Sebrî-F. Husuyin Sağnıç, Seyrana Dil-Helîm Yusiv, Frankenstein-Mary Shelley

MAZLUM DOĞAN



## Gorên şehîdan bûne ziyaret

HASAN KAYA



Di dema civaka mîrîtiyê de, ji hêla çanda manewî ve, kurd pir dewlemend bûn. Efsaneyên der barê şer, tertele, xela, koçberiyê û hwd. de pir bûn. Ji ber ku zanîna pêşve neçûbû, bûyerên ecêb, li her herêmê bi awayekî cihê û li gorî baweriyekê dihatine şîrovekirin.

Di sedsala 19'an de, dema ku zanîna lêkolîna folklor û etnolojiyê bipêş ve çû û xebatên bi vî awayî çêbûn, rojhilatnas li pey efsaneyên mezopotamyayîyan û yê gelên din ên rojhilatê geriyên. Lêkolînerên rojavayî, ji bo ku bigotana, ev lêkolîn baş e, hemû varyant bi dest dixistin, jê sude werdigirtin û peşkeşî xizmeta zanyaran dikirin.

Ev mînaka ku me ji bo efsaneyê da, ji bo hemû cureyên çanda manewî û edebiyata devkî (zargotin) wiha ye. Di gotîneke mezinan de, di biwejek, çîrokek, kevneşop, bawerî û ayînekê de, rengê felsefeya hemû olên ku berê civakê bawerîya xwe pê anîye, heye. Taybetiyên kişwerî, erdnîgarî rengê xwe didin çanda manewî. Li aliyê din taybetiyên hevbeş

ên çandan jî gelek in. Folklorîstên ku li ser çîrokên Macar, Norveç, Alman û yê deverên din lêkolînê dikin, didine zanîn ku gelek nêzîkayî, reng û şîroveyên mîna hev di navbera yê kurdan û yê van gelan de hene. Ev tiştêkî siruştî ye.

Çiqas ku teknoloji û tîkiliyên hilberînê yê bajarvaniyê zêde dibin, çanda gelên zargotin ew qasî tê guhartin an jî ji holê radibe. Ev prensîbeke li gorî zagonên civakê ye. Bi dil û nêta mirovan ve giredayî nîn e. Lê li hinek civakan bi awayekî hovane jî holê radibe, mîna civaka Amerîkayê. Civakên ku hinekî ji otantîzmê hez dikin û ruhê çanda xwe ji holê ranakin, lê kiras û cihêzê wê diguherînin jî hene. Civaka kurdan di vî warî de, ne bi destê xwe ye. Lewre hêj sazîyên mîna dewletê yê ku li ser hêmu tiştên welêt muqtedîr bin, tune ne. Gel bi awayekî xwezayî çanda kevnare dişopîne.

Der barê çanda manewî de, di nav gel de gelek guherînên cihê û mînakên ecêb jî hene. Mînakek jê ev e: Tiştê ku ez zanim li Kurdistanê pir hindik ziyaretên jinan hene. Yê ku ez zanim, li Dêrika Mêrdînê, li gundê Fero, ziyareta bi navê "Bena Eysê", dîsa li Derîkê "Kevirê Zînê", li deşta Lalan, nêzî Çiyayê Gabarê, ziyareta ku jê re "Darika Noka" dibêjin û li wir "Yadê Kerîma" raketiye, hene. Di civaka kurdan de, yek guherîn jî ew e ku êdî ziyaretê jinan pir bûne. Li Nisebînê gora Şehîd Ayten yek ji wan e. Di vê goristanê de li dora 400-500 gorên şehîdan

hene. Gelê herêmê di hemû cejnên olî û neteweyî de gora şehîd Ayten ziyaret dîke. Dîsa li Cizîrê gora Bêrîvanê, li Hekariyê ya Azîmeyê bûne ziyaret. Ev jin, şervanên azadiyê ne û piştî şerê 1984'an şehîd bûne.

Ziyareteke balkêş jî ya Dr. Zehra (Zahîde) ye. Ev bûyera ku bûye efsane, bi kurtî, li Şernexê wiha tê zanîn: Dr. Zehra (Zahîde) Di 1986'an de şehîd dibe, tevî hevalekî xwe. Laşên wan tazî, diavêjin paş traktorekê. Êvarekê li derve dimînin. Suxreyekî Tataran ê ku di belediyê de dixebite, sibê zû radibe, çav li cendekan dîke. Şaş dibe. Ji gel re dibêje, min bi çavê xwe dît nûr nizûl bû. Sê cara nizûl bû, hat li ser cendekê ya jin danî. Piştî vê bûyerê gelek cerdevan dev ji kar berdidin. Dawî gora wê dibe ziyaret. Cihê ziyareta şehîd Dr. Zehra, di ser a Şex Mihemed Kendalî yê Menşur re çêdikin. Yê ku rîş, di laşê van de derdikevin diçin axa li ser gorê di xwe didin. Serê çend mehan axa li ser gorê diqede, çar din tê dagirtin. Tê gotin ku Elî Xan Tatarê ku serokcaş bû û şirikê qetlê Dr. Zehra bû, nexweş dibe. Rîş di laşê wî de derdikevin. Pêşî dibêje ez axa gora şehîd Dr. Zehra di xwe nadim. Lê dawî li ser soza xwe namîne, ew jî axa ziyaretê li birîna xwe dide. Du caran lê dide baş dibe. Li gorî rivayetê piştî demekê dîsa Alî Xan Tatar diêşe, axê di xwe dide, lê wê carê dimire.

Toreya gelan mîna entîkayan e. Zû bi zû namire. Lê di nav salan de kalan û kiras diguherîne.







# AGOT

TU LI KU MAYÎ LAWÔ  
ÇAVÊN ME LI RIYA TE  
BERIMÎN. TU DIZANÎ  
BI SÊ KESAN LÎSTIK  
"OKEY"  
NABE!...

BARZANÎ

HEWÊ DEST PÊ BIKIRA  
ÇI NEDIBÛ, KAK MESUD TE  
ŞIYABÛ LI ŞÛNA MIN JÎ  
BILÎSTA..

Ş. SAKIK



# WELAT

## Rojnameya Hefteyî (Haftalık Gazete)

Lî ser navê  
Gündem Basın ve  
Yayınları  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
SELAHATTIN DELI  
Yönetim Yeri  
Çakırcı Mah.  
Sorguççu Sk.  
No:11/6  
Tel: (0212) 530 01 40

ÇAPXANE  
Yeni Aya  
Matbaacılık A.Ş.  
BELAVKIRIN  
BIRYAY Dağarm  
NÜNERİYYEN ME  
(Temsilciliklerimiz)

München:  
(Nünerê Gîşî ye  
Ewropayê)  
Mahnig Gergert  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871 670 815

BÜROYA İRTİBATE  
(İRTİBAT BÜROSU)  
Ayhan Işık Sk.  
No:23/3  
Beyoğlu İSTANBUL  
TEL: (0 212)  
251 79 37-251 90 13  
FAX:251 90 13

Brüksel:  
Medici Ferio  
32 532 721 12 03

Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yusiv  
Bonn:  
Ahmet Baracklıc  
49 228 66 17 40

Hollanda:  
S. A. Fewzi  
M. SALIH TAŞKESEN 31 104 85 52 43

# Şarê kurd serhewadayinî virastî

**Newrozê emserînî ra jî rind aysa ke torinê zalim Dehaqî senî kenê, wa bikirê, nêşenê roşanê serhewadayin û xoverdayinanê tornanê asînkâr Kaway ci dest ra bigirê.**

Dewleta tirk qandê vergirotin û vngkerdina wateya (mane) Roşana Newroz, ci dest ra çiçi ame kerd. La belê ne şa verê pîrozkerdin bigiro û ne jî şa Newrozî, nevrûz kiro.

Şarê kurd roşanê xo yê serhewadayin û xoverdayin, zey zanayin û vînayina xo dewan, koyan, sûkan û şaristananê Kurdistanî de û metropolanê Tirkiye de pîroz kerd. Vaten ke ca de bo, şarê kurd, nê roşanê Newrozî de dewleta tirk rê da mûşnayin ke, Newroz hakî pêrodayin ra nê, ebi serhewadayina hezarana mardimana meydanan de pîroz beno.

Şarê kurd roşanê xo tam ebi rengê serhewadayin pîroz kerd. Serhewadayin û xoverdayinê girdî, Amed, Wan, Êlih û metropolanê Tirkiye ra Stenbol, Enqere, Adna İzmîr, Antalya û Mersîn de viraziyyay. Dewleta tirk Amed, Wan û xeylê cayanê binan de, şarî rê vardayin virast, xeylê mardimî kerdî dirbetin û xeylê jî giroti zere (binçim). La belê ancî jî nêşa adirê Newrozî hewna kiro. Çimki şarê kurd, qandê Newrozê emserîn, xo ser de

menga adar ra nakişt kerd hedire.

Yanê şarê kurd dostanê xo ya piya, emser jî menga adar zey seranê binan kerd sera serhewadayin û xoverdayin. Xoverdayin û serhewadayinên sifitayinî jû û heştê meng de meydanê Taksîmî de, 12'ê meng de taxa Gazî de viraziya. 21'ê meng de jî, kotî kurdî û dostê ci estê, wijay biy warê serhewadayin û xoverdayinan. Şarê kurd emser roşanê xo Stenbol de dostanê xo ya piya meydanê Kazlıçeşmeyê Zeytinburnu de, nezdiyê 25 hezariya pîroz kerd.

Goreyê programê Newrozî pîrozkerdin seat jû bi. La belê kesî hetanî seat jû nêpawit û mabenê seat 11 û 12 meydanê Kazlıçeşmey de, cayê xo girot û vernameyê (programê) roşanî, adirwekerdin, sloganana û govendana da destpêkerdin. Hetanî seat didi û nîm şarî deyi-rê serhewadayin vatî, govendî antî û slogananê "Bijî serok Apo", "PKK şar o, şar tiya de wo", "Bijî bijî PKK, ARGK, ERNK", "Bijî Newroz" çekardin ra, roşanê serokê xo yê neteweyî û gerilayanê serê koyan pîroz kerd û hetê seat panj bi vilay. Nê pîrozkerdin pey ra, şande jî xeylê cayanê Stenbolî de adirê serhewadayin û xoverdayin ê şarê kurd bi berz. Jêw Stenbol de jî nê, Newrozê emserî Giresun, Samisun, Tokat û Trabzon de jî hetê wendoxanê kurdan û şoreşgeranê tirkana ame pîrozkerdin. ê

Kiştâ bîn ra torinanê asînkâr Kaway



Newrozê emserî teverê Welatî de jî-kêf-weşinanê girdana pîroz bi. Kes şeno wina jî vajo şarê kurd şiyoy kotî eded, tore û kulturê xo; xo ya berdo. Welatî ra çend dîrî benê, wa bibê eded, toran û kulturê xo, xo vira nêkenê. Ek wina nêbiyayê Newroz Japonya û Afrikaya Başûr de pîroz nêbiyê. La belê Newrozê emserînî ra jî rind aysa ke torinê zalim Dehaqî senî kenê, wa bikirê, nêşenê roşanê serhewadayin û xoverdayinanê tornanê asînkâr Kaway ci dest ra bigirê.

**Keyna kurd adirê  
Newrozî Çanakale ra  
kerd berz**

Adiro ke Mazlum Doğanî Newrozê sera 1982 de hîrê çopanê kirbîta fist ci, oyo hetê embazanê ci na hewna nêbeno û iyê roj ra roj ê adirî kenê gur. Adirê Newrozî emser jî zîndanê Çanakale ra bi

berz. Keyna kurd Sema Yüce şewa Newrozî Zîndanê Çanakale de kolonya dîndê xo ser û slogana "Bijî Newroz" a, adirê Newrozî Zîndanê Çanakaley ra kerd berz û tariyê serdaran û zordaran dirina.

Keyna kurd Sema Yüce sera 1992 de jew pêrodayin (lej) de girotiyê zere û mehkamawa dewleta tirk endamîna PKK ra vîstûdiserûnîm ceza da ci û şaş seriyoy awa Zîndanê Çanakale de mendê.

Goreyê vatena doktoran Keyna Kurd Sema Yüce wexto ke arda nêweşxane vato mi xo qandê protestokerdin û pîrozkerdinê Newrozî veşnawo û ez pişman niya. Ancî goreyê vatena doktoran nîmeyê ganê Sema Yüce veşyawo û awa nika Fakultewa Tîpa Çapaya Stenbolî de tedawî vînena.

MEMED DREWŞ

Programê dimilî (kirmanckî/kirdkî)

"ZERDÛSTNAME"

Her şewa şeme, edi Radûna Çevre de.

Frekans: 105.7

Mabenê saet 20.00 û 22.00 de

Tel/faks: 2410502-2410462



ÛLKEDE

# Ji Gündemê

21 adar 1998 şemî:

## NEWROZ PÎROZ BE

HADEP, EMEP, ÖDP, SİP rêkxistinên demokratîk ên girseyî, ku wê Newrozê îsal bi rihê berxwedan, azadî, aşî û biratiyê bi hev re pîroz bikin, îro derdikevin qadan. Ji bo ku li hemû bajarên Newrozê bê pîrozkirin amadehî xilas bûn. KESK, SES û İHD'ê bi daxuyanîyên xwe xwastin ku, Newroz aştiyane bê pîrozkirin.

Gelê Amedê, li Batikentê amadehiyên bo pîrozbahiyê dike û her wiha ev sê roj in dest bi pîrozbahiyê kiriye. Platforma Demokratîk a Amedê diyar kir ku, wê ew li cem gel be. Li Êlihê jî berî niha bi rojekê, gel li dor agirê ku pêxistibû dîlan girt û dirûşmeyên wekî "Bijî Newroz" qirandin.

Heyetên ji welatên wekî İtalya, İspanya, Fransa, Avusturya, Belçika, İngiltere, Hollanda, Kanada, İsviçre, Rusya, Almanya, Danîmarka, Finlaniya, İsveç, Norveç gihîştin Amedê. Di nav heyetan de parlamenter û nûnerên rêkxistinên sivil jî hene. Her wiha heyetek jî di bin serokatiya Serokê Giştî yê İHD'ê de çû Amedê.

22 adar 1998 yekşem:

## HEZARAN AGIRÊ BERXWEDANÊ GUR KIRIN

Cejna neteweyî ya berxwedanê Newroz, li bajarên kurdan, metropolên Tirkîyeyê û Başûrê Kurdistanê jî aliyê bi hezaran kesî ve hate pîrozkirin. Pîrozbahî li meydanan bi agir vexistin, firandina nepoxên kesk û sor û zer û li hin deveran jî bi firandina kevokên spî bi coşên mezîn pêk hatin. Di Newroza ku dewlet dixwaze wê ji rastiya naveroka wê dûr bixe û wekî Nevruz binav bike, daxwazên aşî û biratiyê hatin zik-

mên. Ligel hemû zordarî û astengiyan dewletê, gelê ku bi fistanên kesk û sor û zer xwe xemilandibû, li Batikenta Amedê 50, li Wanê 40, li Êlihê 45, li Ruhayê 10, li Iğdırê 9, li Mazrayê (Elezîz) 3, li Mêrdînê 10, li Stenbolê 25, li İzmîrê 20, li Enqereyê 8, li Edeneyê 3 hezar kes li hev civiyên û bi "Bijî Serok Apo", "Bijî Biratiya Gelan" Newroz pîroz kirin. Di pîrozbahiyên de alên ARGK û ERNK'ê hatin vekirin. Di pîrozbahiyên rêkxistinên demokratîk ên girseyî de, sendîqa û partiyên siyasî jî amade bûn û gelek kes hatin binçavkirin. Li Amedê ligel dorgirtina polîsan gel li Batikentê Newroz pîroz kir. Polîsan êrişî girseya ku di nav de 400 kesên ji heyetên biyan jî hebûn, kirin. Di vê êrişê de 50 kes birîndar bûn. Hate ragihandin ku ji birîndaran 30 kes piştî tedawiya li nexweşxaneyê dîsa birine emniyetê û jina bi navê Mizgîn Şen jî di bin tedawiya domdar (yoğun bakım) de ye.

23 adar 1998, duşem:

## Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan:

### RAHÊJIN AZADIYÊ

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, Newroza kurdan û gelên Rojhilata Navîn pîroz kir û diyar kir ku Newroz ji bo kurdan dîrokeke azadiyê ye. Öcalan di banga xwe ya ji bo gel de got "Tiştên ku hûn bikaribin bikin, hûn bikin. Çimkî partî hûn bi xwe ne. Hevûdin birêkxistin û zane bikin. Bes hûn karin rihê azadiyê bi dest bixin û ji jiyana biçûk dûr bikevin." Öcalan ji kurdan xwest ku di vê roja pîroz de, pîrgirêkên navxweyî çareser bikin.

Her wiha Öcalan diyar kir ku, di vî kurd jî bo her tiştî li benda PKK'ê nemînin. Wî bang li hin partiyên kurdan ên başûrî jî kir û got "Xwe bi dijmin ve girênedin. Kurdperwer bin." Öcalan bal kişand ser helwesta gelê kurd û got azadbûna gelên kurd, bingeha têkoşîna wan e. Öcalan da zanîn ku dewleta tirk her tim pêşniyarên wan ên ji bo aştiyê şûn de vedigerîne û got ew ji bo şer îsrar nakin lê ji bo şerkirinê jî heta dawiyê amade ne. Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan wiha berdewam kir: "Em çiqasî jiyana kole û binketî ji nava xwe biavêjin, biratî û yekîtiyê bi cih bikin, em dê ewqasî jî biserkevin. Tu kes nikare me bixe."

24 adar 1998 sêşem:

## AGIRÊ NEWROZÊ BI



Dimenek ji pîrozbahiyê Newrozê ya li Stenbolê

## BEDENA XWE PÊXIST

Girtiyê PKK'î Sema Yüce ku, di Girtîgeha Çanakkaleyê de radizê, ji bo protestokirina zordariyên li ser gelê kurd, polîtîkayên tunekirinê û şerê qîrêjî, agirê cejna berxwedanê ya neteweyî-Newrozê bi bedena xwe xist. Yüce, çalak iya şeva 21'ê adarê, kolonya bi ser xwe dakir û pêk anî. Li ser xweşewitandina Yüce, hevalên wê/wî yên girtî, ji kargerîya girtîgehe re gotin û ew rakirin Nexweşxaneyê Dewletê ya Çanakkaleyê.

Lê ji ber şewata xedar ew bi ambulansê birin Nexweşxaneyê Şişli Etfal a Stenbolê dû re jî ew rakirin Fakülteya Tıp a Çapayê beşa Cerrahî. Sema Yüce ku ji %40'ê laşê wê, qirik û devrûyê wê bi awayekî xedar şewitiye, girtin bin tedawiya domdar (yoğun bakım). Doxtoran daxuyandin ku rewşa Sema Yüce cidiyeta xwe diparêze û hişê wê hîn ne li serê wê ne. Sema Yüce, ku ji gundê Aşağı Kargılı ya Dûtax a Agirî ye, di adara 1992'yan de, di şerekî li Agiriyê de hatibû binçavkirin. Yüce, dîw re di dîdgehê de, ji endametiya PKK'ê hate girtin û 22 sal û 6 meh ceze lê hate birin. Sema Yüce di Girtîgeha Sergirtî ya Tîpa E ya Çanakkaleyê de cezayê xwe diborand û 26 salî bû.

25 adar 1998 çarşem:

## HIKÛMETÊ AMBARGO DANÎ SER PIRSA 'ÇETE'

Parlamenterê DYP'ê yê lçelê û endamê Komîsyona Susurlukê Fikri Sağlar, da zanîn ku hikûmetê dev ji hukumkirinê berdaye, parlamento jî ji mekanîzmeya kontrolkirinê derketiye. Sağlar diyar dike ku ji bo pirsên derheqê çeteyan de tu bersivan nasîne û got "Ser kêmasiyên ku bi xwe kirine, digi-

rin. Ew çi vedişêrin?"

Parlamenterê CHP'ê yê Sêwazê Mahmut Işık jî got ku beramberî pirsan bersivên rast nadin, dev ji bersivên rast berdin, bersivên wekî ku henekê xwe bi mirov bikin didin û dibêjin "Veli Küçük leheng e, endamêkî hêja yê artêşa çekdar e, lê ez vê napirsim." Sabri Ergül jî bal kişand ser vê yekê ku rêznameya pirsan ji beşa birêvebirinê yek ji mekanîzmayên girîngtirin e û wiha got: "Min ji bo pirsên derheqê Çiller û malê wê de tu bersiv nestand. Wezîr agahiyan nadin. An jî ji bêgaviyê pirsan dibersivînin. Di vê mijarê de ez bang li Wezîrê Meclîsê dikim ku karê xwe bike."

26 adar 1998 pêncşem:

## "EM BI QÎZA XWE SERBILIND IN"

Rewşa Sema Yüce, ku şeva 21'ê adarê li Girtîgeha Çanakkaleyê de agirê Newrozê bi bedena xwe xistibû hîn jî xedar e û cidiyeta xwe diparêze. Sema Yüce ev sê roj in li Fakülteya Tıp ya Çapayê di bin tedawiya de ye. Nasên Sema Yüce yên ku li ber nexweşxaneyê dimînin, bûn hedefa êrişên leşkeran. Leşkerên ku xwestin li nasên Yüce bixin, ji aliyê doxtoran ve hatin sekinandin.

Dê û bavê Sema Yüce, Sabri û Zenûre Yüce ji Agiriyê hatin serdana qîza xwe. Malbata Yüce got ku, ew dixwazin Newrozê bi awayekî biratî, azadî û aşî pîroz bikin lê zordarî û çewsandinên dewletê bûye sedema vê bûyerê ku qîza wan bi vî rengî protesto bike. Diya Yüce Zenûre, diyar kir ku çalakiya qîza wê, wê gelek serbilind û bi coş kiriye û got ku Sema, her tiştî bi zanayî dike û ji çalakiya wê re rêz digirin. Sabri Yüce jî got ku bi qîza xwe serbilind e.



Girtiyê PKK'î Sema Yüce